# Writer Cultural magazine

## گوڤارەکا ڕوشەنبیری و چاندێ یە و نیڤ هەیڤی یە

## Kovarekê Rewşenbîrî û çendê ye û Nîv mehî ye

## مجلة ثقافية أدبية و نصف شهرية

**ب زمانێ کوردی و عەرەبی دئێتە وەشاندن**

***Bi zimanê kurdî û erebî di ête weşandin***

***تصدر باللغتين الكردية و العربية***

گوڤارەکا رەوشەنبیری، وێژەیی ئیلکترونی یە ژلاین گروپێ نڤیسکارێن کورد ڤە دئێتە بەلاڤکرن

# گوڤارا نڤێسەر

## مجلة الكاتب

ثقافية، أدبية

Nazeer Chembahivy نظير علي **69** رەوشەنبیری، وێژەیی

**10/6/2025**

**Www.kovaraniviser.net**

# Kovara Nivîser

Kovareke Ruşenbîrî, wêjeyî êliktruni ye ji Layê gurûpa Nivîskarên Kurd ve di ête weşandin



ئیمتیاز و سەرنڤێسکار: نەزیر چەمباهیڤی

**Îmtiyaz û Sernivîskar: Nazeer chembahivy**

الامتياز و رئيس التحرير : نظير علي

گروپێ نڤیسکارێن کورد

Gurûpa Nivîskarên Kurd

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



## سەرگوتار

نڤێسین: نەزیر چەمباهیڤی

# خیڤەتێ بپارێزن فەلسەفە بێ مفایە

هەکە جڤاکەک یان نەتەوەیەک ما ب دیف تشتێن پویچ و هیچ ( تافە ) ڤە و هشیار بوون نەما دێ هەست لاواز بیت هێدی هێدی هەتا هەبونا خو ژی ژ دەست دەت، ب شێوەیەک دن دێ ژ قالبێ مروڤبوونێ کەڤیتە د قالبێ گیانەوەریێ دا و کوێلاتی و لەگلەگایەتی د ناڤ دا سەرەکی بن، وەکی د سەرهاتیا ژ ئەدەبیاتا جیهانی دا خیڤەت لێ هاتی دزین و ئەو مژیلی فەلسەفەک بێ مفا و نەوەرگرتیێ چ مافا، ئەدەبیات دبێژت دوو هەڤال ( شارلوک و واتسون ) چون گەشتەکێ ژ دەرڤەی بازێڕی ( چولێ )، پشتی خیڤەتا خو ڤەداین و دەست ب چێکرنا شیڤا خو کرین، پشتی ب شەڤ ژ خوارنێ خلاس بین، د خیڤەتێ ڤە نڤستن، دەمەکی درەنگ شەڤێ شارلوک هشیار بو و بلەز واتسون هشیار کر، گوتێ واتسون تو چ دبینی؟،

واتسون گوتێ ئەسمانەکی سافی و تەژی ستێر،

شارلوک گوتێ ئەسمان چ دبێژتە مە؟،

واتسونی هزرێن خو کرن وپاشێ گوت:

ب زانستێ فەلەکناسی دبێژت ب ملیونان و ملیاران ستێر هەسارە یێن د گەردونی دا،

ب زانستێ ستێرناسی دبێژت بورجا زەحەل یا د بورجا شێری دا،

ب زانستێ دەمی دبێژت دەمژمێر نیزیک سێی شەڤە،

ب زانستێ ئاینی ( دین )ی دبێژت ببینن شیانێن خودای چەندن،

ب زانستێ کەشناسی دبێژت سوبەهی سافی یە و دێ وەختەکی خوش بورینین،

پاشێ واتسونی گوت شارلوک تو چەوا ئەسمانی دبینی،

شارلوکی گوت هەی گەمژە خیڤەت چو و هندەکا خیڤەتا مە یا دزی و ئەم نڤستی و تو یێ مایی ب فەلسەفا زانستا ڤە،،، ئەڤجا بەداخەوە چەند جڤاک و نەتەوە هەنە و تێگەهشتنا وان هند یا کورەیە و لاوازە هەمی ماف یێن ژێ دهێنە ستاندن ژ هەمی ئالیان ڤە و هەر مژیلن ب هندەک تشتێن دی ڤە و ئاگەهـ ژ خو نینن.

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە

زمانی کوردی....
ل شەمزینان عەلی حەریری
دەما دە مروانا لێ کری
ئەحمەد سەیدای جزیری
زمانێ خوە نەکە ژ بیری
ل بازیدێ ئەحمەدێ خانی
زمان کر وەک ئاڤا کانی
میرمحێ، فەقییێ تەیران
ب کورد داخڤی ب تلووران
شێخ ئەڤدڕەحمانێ ئاقتەیی
لێکر کوردی ب تیپین عەرەبی
مەلا حەسەنێ باتێ لێ کری
مەولوود کورمانجی چێ کری
هاتانی میرێ جزیرابۆتان
مرجان بوو ژ بۆنا کوردان
میرجەلادەت بەدرخان
چاڤکانی ژ بۆنا زمان
قازی موهاممەد سەرۆک
ل گەردوونێ بوویە دیرۆک
مەلا مستەفایێ نەمری
گۆت زمانێ مە نامری
مەلا محەممەدێ سەیدا
تم د ناڤا کول و دەردا
عەبدولقادر، قەدری جان
پڕ خوەش لێ دکر زمان

ژ حەسارێ جگەرخوێن
تم دگۆت کوردی بخوێن
مەمێ عوسمان دبێژە
ژ کوردی گەوهەر درێژە
سەیدا نایيفێ حەسۆ دگۆت
تم ژ بۆ زمان دل دسۆت
سەیدایێ ئەحمەدێ پالۆ
ژ بۆنا زمان شەڤ و ڕۆ
کوردنۆ! دل بدە زمان
ژ بۆنا ببی خوەدی ئیمان
کوردستان ئەم سۆز ددن
ئەمێ وەلاتێ خوە ئاڤا کن
کوردستانا من تو نەگری
زمان، چاندا مە نامری
کوردۆ! گەر زمان بمرە
نەتەوە هەموو پێرە دمرە



هەلبەستڤان
م. مەلاێ بەدرخان
سیداێ میردینێ



69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە

## هەلبەستڤان

م. لەزگین گراڤـێ ـ زاخۆ



## ـ تـــەمــەن ـ

زیێ مە چوو دل یێ مری
خۆشـیا دلی خەمـا بری
عەمرو تەمەن قەدیان بوری
ڕۆژ و دەمان خوە گهوری
بیـرهاتن بونـە ئێش و ژان
هـەر بێ دیدارو بێ ژڤان
سال و دەم بورین بێ پرسیار
ژ دەربـان هەر دل بـریندار
چاڤە رێ بووم نامەک نەهات
دل هێلان ب ژان و شەوات
کێ زانی یە دەردێ بولبول ؟
ئاواز خۆینە بئاهـ و کول
ئاڤ بوو دوکەر لڤێ بەستێ
پێل و مەیاڤ پێچەک مەستێ
پایتەختێ زینێ ب فەرشان
ل دورگەزو و هنگڤین و شان
نــەبێژن بیلناز بێ نازن
دلنازن عەشق و ڤین خازن
شەڤ ڕەشا مە بەسە هەرە
دلـێ تـە ئاسـن و بەرە
فەلەک بەسە کەرب و زۆری
مە هێز نەما تەمەن بوری

69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە





# رەش ئەسمەرێ

رەش ئەسمەرا دێم گەوهەری
دوو چاڤێت رەش پرچ قەمەری
هاتم کولانا وە گەریام
رەش ئەسمەرا من نە هاتی
کولان کولان من دنێری
هاتم و چووم من تو نەدیتی
ئەڤ چ دلە هندە یێ رەق
تە د سینگێ خوەدا هەل گرتی
تو د زانی من یا حەشتە کری
دێم و رویێت تە سور گولی
نێ دلێ من دا بەس توی
چارە و دەرمانێ دلێ من
هەمبێزکرنا من و تە بوی
دێ وەرە رەش ئەسمەرا من
خەو ناچیت بێی تە شەنگا من
بە نوژدارا ئەڤینا من
گەریام گەریام ڤێ دونیایێ
نە خوش کەتم ئێش و تایێ
جان و شرینیا تە کوشتم
سووت جانێ من سەر دونیایێ

***هەلبەستڤان: م. وەلات کوردی***

69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye





ئافه رین
سه د ئافه رین
ئه ی نازه لین
كول و برین
سه د و ئێكن
ده رد و كۆڤان
لناڤ دلی مان
بارێ خه مان
هه ر ده ست پێكن
چه ند بژانه دل
تو مایه سل
زێده بون كول
نێ ئه م ئێكن
خۆشی و بوهار
بونه یادگار
پار و پێرار
بۆچ نه ژئێكن
خۆ سل نه كه
تو دل فه كه
چا ڤان فه كه
گری و كه نی نه ئێكن
شه ڤ تا سحار
هه ر وه ك هه رچار
ئه ز مام هشیار
هه می عاشق نه وه ك ئێكن

هەلبەستڤان: م. عزەدین بابێ مێڤان

Kovara Nivîser ya Ruşenbirî
مجلة الكاتب الثقافية
69
10/6/2025
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye





هەلبەستڤان: پێدەنگ دۆلەمەری

ئێڤاری باش.......

ئێڤاری باش هەی جانا من
پادشاهێ سولطانا من
نۆژدارا ئێش و ژانا من
چەند نازکی خوین شرینی
سلاڤێت من بۆ تە یارێ
سپێدێ هەتا کو ئێڤارێ
گەورێ ڕندێ ئەڤینداریێ
چما حالێ من نا بینی
خەملا خۆ بکە پرچێ شەکە
دەرگەهێ مال ژ من ڤە کە
ئەگەر هاتم من دەر نەکە
گەلەك توو من د ئێشینی
هەرۆ سپێدێ و ئێڤارا
دچمە سەر ڕیا ئەڤیندارا
تە نا بینم ئەز چ جارا
یا هۆسا نینە ئەڤینی
ئەز بێ حالم پەریشانم
بێ هەڤال و بێ سەمیانم
بەختێ تە مە وەرە خانم
دا خەمێت من ب رەڤینی
ژعەشقا تە هار و دینم
ناما ژ تە را د شینم
تە گۆت ناما ڤە نا خوینم
توو بۆ چی هندا خائینی



# هەلبەستڤان
## م. شەعبان هەدێنەی

هەڤرکن ژین وژان

ژ پایزا هەر دوو برها
دلبەرا من
دل مایە ژار و من ڤیا
دەرد و کوڤان بونە هەڤرک
هەر وی دەمی
نەرمە باکێ چیا هاتۆ
پرچا زێرین پێ هەژییا
لەورا نوکەئەڤینا مە
باوەر بکە...
ژ خورتیا مە ددلدا
ئەو کەلا مە ئاڤا کری
بۆ نوی ژینێ
ژ وان ئومێد و هیڤیا
بلا تەڤ دوژمن بزانن
مینا چیا...
یا کەڤنار و خورستی یە
چ هرەبا، ناهەژینن
هەر دێ مینیت راست و موکوم
دلبەرا من...
چاوان مە خاست و مە ڤیا
چاوان مە خاست و مە ڤیا

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



## ( مەحبوبێ من )

د بەینا مان و نەمانێ
من پێشەیی دا ڤیانێ
من گۆهـ نەدا ئەڤێ ژانێ
ڤیانا من یێک لایەن بوو

من درێژکر دەستێ سۆزدار
مەحبوبێ من یێ دوو ڕوخسار
ل ڤێ ڤینێ ئەوە خەمسار
ما قەی ڤینێ ئەڤ شایەن بوو

من گۆت ئەم دێ پێکڤە فڕین
پێکڤە دێ جەننەتێ کڕین
گۆت نەشێن ( أقطار ) ـی ببڕین
ل وور هێلام و خایەن بوو

یا بسەر من هاتی ئەڤە
وەسیەت ژبۆ عاشقان تەڤە
ب طەلها ڤینێ نەکەڤە
بەرهەمێ وێ بێ دایەن بوو

هەلبەستڤان
م. ڕزگار محمد ئەمین

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



هەلبەستڤان
م. باڤێ هوزان

فەلەک بێ بەختە

فەلەک دین بوم بە ڤی ڕەنگی
دەم و دەوران حەتا کەنگی
ئەز بمرم و بێ دنەگی
فەلەک! ئێدی بەسە.........

ئێش و نالین د دل دەیە
قیر و هاوار بێ فایدەیە
ولاتێ من بۆ دەستایە
فەلەک! ئێدی بەسە.........

حەتا کەنگی ئەز وابم
بارێ دەڤێ گورا بم
بێ دوست و بێ خودان بم
فەلەک! ئێدی بەسە.........

ماقەی بەختێ مە تم ڕشبێ
دلی دوژمن بە مە گەشبێ
بێ رۆنی و شەڤە ڕشبێ
فەلەک! ئێدی بەسە.........

ولاتێ من وێ رزگار بێ،
دلی من بە کلی شابێ،
سەر بلّند، خۆش خۆیا بێ
فەلەک! ئێدی بەسە.........



دایکەک قارەمان
شیرێ خۆ بخۆ بلەز بە کۆرێ من
هەڤسەنگەر هەمی ماینە لبەندامن
دیسان هێرشن ل سەر وەلاتێ من

بخۆ بخەوە تۆ بەس بکەی گری
ئەم دێ چن ژ والات بکەن بەرگری
بابۆ خالێت تە وان شەهید کری

وا دۆژمن هاتن جاردی فەرمانێ
وەك رۆژێت ئەنفال کیمیا بارانێ
مە زیندەچال بکەن لناڤ بیابانێ

مە شەرنەڤێتن لێ نەبدەست مەیە
ما ئەم دێ چ بکەین قەدەرا مەیە
فەرە بەرگری ئەۆ ئەرکێ مەیە

دێ بخۆ مەزن بە و ببە قارەمان
ل پێشیا مە چەند شەرۆ داستان
هێشتا بن دەستە وەلات کۆردستان

**هەلبەستڤان**
**م. هەژار سندی**




بابێ مەزن....
هزار سلاڤ ل گوراتەبن
نێرگزو گول خەملاتەبن
رویبارو سیلاڤ بەژناتەبن
تێهنیێن رێبازا تەبین....

شەڤ و روژا بێ راوەستیان
تەڤ وان عەگیدێن قەهرەمان
دەشت و چیا تە شەقاندن
چریسکا شورەشێ هلدان ....

پێشمەرگێت تە دێ هەر هەبن
تومارکرن چەندین داستان
تیرور و دوژمنێن کوردان
هەمی لژێر دەوسا پێ تەبن ...

چ جارا ئەم تە ژبیر ناکەین
کەلتورێ تە هەر دخوینین
مژدە و کوردینی خەلاتن
ستێرێن ئازادیێ دژەنن ...

نەڤیێ و کورێن تە سەرکێشن
قەسە و گوتنێت تە بجهـ دئینن
نەخشە و سنور وان دارێژتن
ئەو دێ دەولەتا مە چێکن ....

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
گوقار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



# ئاوێنە

هۆمەر نۆریاوی

دارکاژێکم من پێ شک دێت،
ساتێک ئەبێتە کۆڵەکە،
ڕۆژێک بۆ خۆی چیای میهرە و
لەمێژیشە گەر ئەو نەبێ،
لە خودی پاییز ڕووتتر و
بەهارێ تر نابینمەوە.
کە خەم لە چاوما ئەبینێ،
هەزار خەمم لە کۆڵ ئەگرێ و
بەم ڕۆژگارەش پێئەکەنێ.
پێنووسم گەر هێشتا کەسکە و
بە خەیاڵیش سەوز ئەنوێنم،
هەموو ڕۆژێک،
وشەیەکی لێ قەرز ئەگرم؛
ئەیدەم لە بەرۆکی شیعرم و
وەک ئاوێنەش،
خودی خۆمی تیا ئەبینم.

هەلبەستڤان
م. هۆمەر نۆریاوی

69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە



بای.....

تو ژ نەبوونێ یا بووی هەی
تو ژ بێ هەستەکێ یا بوویە هەست
لەوما
هەبوویا دکییە نەبووی
هەستا دکییە ئیکستەیشنەک
د ناڤ پرچا خوە ئالزی وەردکی
عەینەن
ئەڤینا تە ژی وەکو ستریکێن سنایێ تەنە
دچیت و نازڤڕیت
ئەز پەشێمان نینم ب چوونا تە
هەردەما تو زڤڕی ژی
دێ پێشوازیا تە کم ب دو تفێن کوژەک
دا ڕوییێن تە یێن تەنیگرتی سپی بکم
دا پۆدۆکس و فیلەرێن تە ژ سەر قرێژا تە یا ڤەشارتی ڕاکم

هەلبەستڤان: م. عبدالحمید مەندانی

BAY....

Tu ji nebûnê ya bûy hey
Tu ji bê hestekê ya bûye hest
Lewma
Hebûya dikiye nebûy
Hesta dikiye ikisteșinek
di nav pirça xwe alizî werdikî
´Eînen
Evîna te jî weku stirîkên sinapî te ne
Diçît û  venagerit
Ez  peşêman nînim bi çûna te
Herdema tu vegerrî jî
Dê pêşwaziya te kim bi du tifên kujek
Da ruyên te yên tenîgirtî sipî bikim
Da podokis û fîlerên te ji ser qirêja te ya veșartî rakim

Helbestvan
M. Ebdulhemîd MENDANÎ



69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە



Helbestvan
M. Muhemed babê Nîgarî

çend sal bo ji min hindabî
ji nişkekěve min ew dît
min hewil da silav kemě
ezmaně min ma hişku pît

bi sersorman u bědengî
li ser milě xwe zivirî
bi rengekě pir damayî
li roxsarě min fikirî

kele girî ket ser lěva
ewjî ma bě dengu xeber
ya dîyrbu ku bi sala
wě rakirbon xemu keser

em herdo bě taqet ketîn
me neman bizavu livîn
axînko rondikěn çava
rě neda hevra bi civîn

Dîdareka nax hejîn bo
yabě hembězu bě silav
her weko xewneka aloz
yabě livîn u bě bizav



69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان موڵەتە

KEVOKA AŞTIYÊ



Helbestvan
M. Salma Alyoussef

Me nav li te kiriye evîna paqij
Wek ava zelal diherikî
Ji ber ku tuyî...
Ya ku nameya aştiyê belav kiriye
Li seranserê cîhanê
Bi wan reng û perên xwe yên nazik
Hildiweşînî ser mirovan silavên gerim
Di warê ronî de li erd û ezmanan
Şevên reş ronî dikî li ser ardê
Xelkê şahîdar û dilxweş dikî
Hêviyên jiyanhezan xurt dikî
Wek stêrka ronî daya
Wek ewrê buharê
Xunav bi ser gulistanan de barandiye
Te hêlîna xwe li ber deriyê şikeftê çê kiribû
Da ku pêxember olê aştiyê biparêze
Ji zordariya dijminan
Da ku xwîna wan nerije
Û kesên gawir birevin
Armanca wan bi cih were
Û viyanê di dilê evîndaran de mezin bikî
Û bi bêhna xwe ya şêrîn jiyanê fereh bikî
Deriyê fereh ji penaberan re vekî
Wan ji xem û nexweşiyê rizgar bikî
Bi bêhna xwe ya fereh
Canê wan kêfxweş bikî
Tirsa terorê ji dilan derînî
Te Tîrêja rojê tev de kiriye gurzek ronahî
Û berdaye ser rûyê evîndaran
Bi evîn û dilxweşiyê dihûnî
Bi destên evîndaran gulan diçînî
Ava dikî paytexta jînê
Û difirî li nav baxçe û gulistanan
Te xemilandiye hemî werzên salê
Li erd û ezmanê va cîhanê
Xemilandiye bi şalûl, bilbil û kevokên spî
Tîpên helbesta min wek berfê belav dikî
Bi fîxan û stranê evînê
Hemî kesên aştîxwaz şa dikî



## EZ NE KEWIM NE KEVOKIM

Helbestvan
M. Hemîd Xanoser

Ez ne kewim ne kevokim
Bask şikestî rebenokim
Bê dest û ling û bê çongim
Ne difirim ne dimeşim

Xerakirin hêlîna min
Anîn xwarê kulîna min
Kûrtir kirin birîna min
Nav û dilêm dije êşin

Min nedît havîn û payîz
Bihara min nebû ezîz
Zivistana lmin dikir zîz
Nema êdî karim bêjim

Berf girtî ye ber hêlînê
Livîn tunin li kulînê
Çawa nekişînim şînê
Bûme şel û şaht û gêjim

Hêlîn sare pir xedare
Nizam ev çi rewş çi hale
Min qet nedît roj meh sale
Mîna xelkê ku ez bijîm



69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوقار فەرمی یە وخودان مولەتە

## Helbestvan
## M. Dilan Maku



**DEM BAHARE**

Dilê min hatina te ra dare,
Wek hîva adarê nûr dibare,
Kelecan birqê çeva de hare,
Ne dildar im lê ez dilovan im,

Dem bahare, ax dil diwêşîne,
Nav hevala de dewrêşek jare,
Çerxa dinê de delala nare,
Sal û demsalê wê tengezare,

Dem bahare, tê dengê berx kara,
Ber çavê yarê tim fedekare,
Dil dişewite her sitemkare,
Evîn diwêşîne her navdare,

Dem bahare, xûna sor pir hare,
Kewa guzel rabe j'xew sihare,
Nayê bejna zirav, roj d'be êvar,
Dil, milak li min dibe neyare,

Dem bahare, tev xemil û xêle,
Bextê xwedê me tu min nehêle,
Bila neçilmise ev lalizer,
Dilê minî dîn te bibe helale,

Dem bahare, dibişkivin dare,
Vedibin gul sosin li beyare ,
Delalî minî çeleng biryare,
Şev roj navê kurdustan dinale,

Bê hiş û nezan;
Ez rûniştim li nav gel û civatê
Min gote wan çend lefz ji xîretê.

Gote wan çend peyv û çend kelam
Ji rastîyê bawer nekirin wesellam.

Kuro hûn kurdin lawê kurdanin
Hun çima tim li bin barê neyarin.

Yekî gote min heval bê guman
Sehnekirîye van peyv û gotinan.

Guh didime te û van buyeran
Ji peyvên te tê bêhna ‘ereban.

Min got hey birayê min ê delal
Tu çima bawer nakî hey heval.

Ji peyva diherike dîrok û destan
Rastî eve dibêjim we bi rih û can.

Ma hûn nabinîn ezim lawê Kurdan
Di serê min de azadîya Kurdistan.

Dil û mêlak li min kirine talan
Ax ewan kurdên xişîm û nezan.

Xwe fırotin bi komir û maqarnan
Birayê xwe kuştin ji bo çar qurişan.?

Rih û mejûyê xwe kirine bin destan
Bes nebim qûlê ber dergahên kesan.

Tenê hêvî dikim ji Rebê Rehman
Tu min xelaskî ji van bê ‘eqilan.

Dinivîsim bi pênûsa xwe destan
Xizmetkarê gelê xwe me bêguman.

Welekorî bi hewar û qîr û gazî
Li we bêhişa dike bangewazî.

Neyar talankir welat tu hêj razî
Bese tu rabe çima wer belengazî.

Helbestvan
M. Seyfettin Temel



69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە

**Helbestvan**
**M. Nezhet Sîdo**
**( Dayika Raman )**

Penaberê penaberê
rû hingivê wa esmerê
Dema tu çû û te barkir
Mam bi tenê li vê derê

Ji ber çavê min tu nare
Dunya bimin xav û sare
Çuna te gelek dicware
Birînek kûr pir xedare

Herdema tu tê bîramin
Agir dikeve xwîna min
Tev radibe birîna min
Pirtir dibe nalîna min

Dilêmin herdem dinale
Ji dûrbûna te bê hale
Tu çû min tu şahî nedî
Jiyan bimim xav û tale

Ezê çibkim ez nizanim
Birîndarê bêdermanim
Bêwar nabe bêyar nabe
Bexçakim bê gul û darim



69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوقار فەرمی یە وخودان مولەتە



## KULÎLK A TEREZ,

Bin pîyên te ez bûme erd û xwelî
Nizam çima min acizî min sil î
Ev bextê min neyê serê tu kesî
Derd dibare wek berf a kulî kulî

Te dinêrim kela dilêm gurr dibe
Dem disene aqil fikir  hur dibe
Eşq û evîn heyalan da digire
Hest diteqe hîsên nazik pir dibe

Ruhistîn o min bikuje zû bilez
Biherike xwîna mine sor gevez
Bextê te me li min bike qencîkî
Xilaz bike destê kulîlk a terez

Dest min nîne îdî bi xwe nikarim
Êş girane deh derba birîndarim
Bêdengî ya xeder şayîr dikuje
Xeber nedî ez rêwyê axa sar im

*Helbestvan*
*M. Ayhan Demir*

69 Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوقار فەرمی یە وخودان مولەتە



## PIR ZEMANE

Mecnûnê geş dem bihûrîn hev hesretin,
Ber vê rewşê em qehirîn bûn bê bextin,
Ça teyrê baz sal zû firîn çev nedîtin,
Bendewarim te bibînim hîlaşê min.

Qemet tîtal xortê qeşeng dilêm vekir,
Tovên hubê bi şox û şeng çand û cotkir,
Bêcar kir xemxur reng bi reng tenê bêhnkir,
Baqkim gula te ra bînim hîlaşê min.

Rehîşk pirî kûre ketye, dil û cerge,
Nayê birîn can peritye  cil û berge,
Tûne rê û rêbaz girtye, der û derge,
Pira çêkim te kewînim hîlaşê min.

Ciwanya kaw hev ra meşand lê dest negirt,
Hev ra kenyan hêsir barand qesr venegirt,
Bo evînê hiş me firand bûne dîl girt,
Carek himber te mêzekim hîlaşê min.

Hevdura em pir zemane bûn sî, sitar,
Li ber hecê bi gumane me da qirar,
Bibin melhem, dû-dermane nekin firar,
Dijîm bi te û zangînim hîlaşê min.

Helbestvan/ M. Seyrana Celad

Seyran a Kurd û Kurdistanê
Li ser şopa Zîlan û Bêrîtanê.

Ez Kurdistanim
bi bax û bustanim
dermanê derdê
nexoş û xestanim

Çiya û deştim
seyîran û geştim
ez wek buhiştim
ez Kurdistanim

Ez deşt û çiyame
tivinga merdame
kula dilê neyarame
ez Kurdistanim

Nanim ji sêwyare
çavim ji rêwyare
piştim ji bêxweyare
ez Kurdistanim

Warê e´gîda me
daka şehîda me
azadya e´bîda me
ez Kurdistanim

*Helbestvan*
*M. Salim elşehwanî*

الشاعر
أ. سالم الشهواني



69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە

# Li Kobanê

Li Kobanê qîrînek tê
Û nalîna birîndara
Li bin kevila xirînek tê
Ji lêdana van neyara
Dixwînêde û gevizîn
Ji destê pîs û mirdala
Hewar weleh em insanin
Em ne marin li beyara
Em bê sûc û em gunene ?!
Me çikiriye j' azara ?!
Sûcê me çima em kurdin
Ev nav dikuje neyara

Li Kobanê girî û şîn
Koban canê wê birîne
Dibarîne ji dil pir xwîn
Koban êşê pir dikşîne
Çavê dunyê tevî dibîn
Ev kuştin û rrik û kîne
Zagon û peymanên qirêj
Rastiyê l' nav xwe dimrîne

Koban navê te pîroz
Weke şara ser sûka
Qîz û Xortê te lehengin
Mîna şêra , weke Loka
Te b'mêranî daye denge
Ez gûriyê çavê bûka

Koban kaniya mêra ye
Ti nasnama me kurda ye
Te b'mêrxasî te dengda ye
Şûrê sitwê neyara ye

Ev dijmin dil qitrane
Bê insafe û bê ojdane
Dilqirêjkî bisilmane
Ji tovê yacoca mane

Kobana  min xwe girêde
Berşema zêr dor inyêde
Yacûca  têxe tirbêde
Xemlê berde l'ser bejnêde

Ev neyarê me kurdane
Ji demê bavûkalene
Tim nûdibin nifşê wane
Divê hilkin koka wane
Ku  xelasbin j' şerê  wane





*Helbestvan*
*M. Wehîba Îsa*

69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە



hey lê rindê  li min  biger . rendevana min
hey lê rindê ji min meger.eşqa çavê min
dilo canî min tu şake.xem revîna min
eşqo evînê diyarke.hew jî ji bo min

cano dilî mi ji tera rendevana min
tu ji bîr nabê qet ticara.ronya çavê min
ez hemêzkim bejno bala.li ser serî  min
ez hemêzkim desto dila.li ser çavê  min

evîna te xweşo geşe.her tim bîra min
hêvya dilî min ji tera.sewdalîya min
hêvya dilî min ji tera.dengo dilê min
tu ji mira wek xezala.jîno jîna min

hey lê rindê  li min biger.rendevana min
heylê rindê ji min meger.şewqa çavê min
dilo canî min tu şake.xem revîna min
eşqo evînê diyarke.sewdaliya min



*Helbestvan*
*M. Bavê Mehmûd*

# MÎNA ÇEMÊ MANZÛRÊ

Wê bên, herin dem û sal,
Bimînim bê milk û mal,
Soz û guman dabû dil
Wêra bistrêm ça bilbil.

Rokê gerdûn tev-hev bû,
Volkan, agir lê rabû,
Dêmê royê çilmisand
Ruh qefesê fetisand.

Sîmê sazê min qetîya,
Rast, derewa veqetîya,
Şoza dayî bû seqet
Nexweş ket, ma bê taqe

Kire nalîn tembûrê,
Mîna çemê Manzûrê,
Çev hêsir û dil bi xwîn
Pêjda kişîya rik û kîn.

Me nizanî çîye ferman,
Hevildor bû mij, dûman
Jîyana man-nemanê



*Helbestvan*
*M. Hinara Tajdin*



69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە

## Evîna te xanim

*Helbestvan*
*M. Elî Omer*



Wek sosinên xwestekan jêkirin
Ji bêrîkên baxçeyê zarokan dikeve
xewnên min ên pembe
Wek hasrat Sanabel dît
Êlyas ew westiyayî
li pişt birîkên baranê difûre
Di valahiya ewrê evînê de
Bi aramî û aramî bimirin
Mîna govendê beg
Li kolanên bêhêvîtiyê bigerin
Sirûdên belengaziya xwe dixwîne
Li ser peyarêyan deng û bêzar
Wê birînên melodiyên xwe yên çîgan birrîn
Mîna bilbila kor a belengaz
baskên şikestî
Hêviyên Dia winda bûn
Di bin lingên dînbûna stiriyên tariyê de
Reşiya ebedî dişewite
ji te hez dikim xanim
Zeviyên ezabê qamçiyan derdixe
qamçiyan canê min ê girtî
Di navbera dîwarên dojehê de bêaqiliya te
Rabid wekî nifirek herheyî



69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە



Xêrnexaza
EZ ji xewa şêrîn
Rakirim..
Xewna mine Ciwan
Wêran kirin..
Jiyana min tarî Kirin
Hemû tiştên
Bedew hinçiqandin
Sitemkariya xwe
Berdan li ser rûyê erdê
Hemû hêviyên min kuştin
Dilê min Kirin hêlîna
kul û derda ...
Hestên min birîn Kirin
Bê dilovanî ...
Xew di çavên min de
Qedexe Kirin..
EZ bûme kevoka binê zinara
Rengê jiyana min reş Kirin



*Helbestvan*
*M. Halima Can Kobani*

# Li te digerim



Li te digerim li her cî û wara
Li te digerim li gund û bajara
Dîtina te dixwazim ez belengaz im
Bê te ez sêwî mam li ber dîwara

Der bi der ez dipirsim li wan reşçava
Ji her kesî dipirsim ji roka ber ava
Tu kes nizanî kanî yar kanî
Kanî sebra dila ka bînahya çava



Li her derê digerim li te sorgulê
Da tu wek heyvê carkê li min hilê
Xew li min nema sotim ji xema
Derdê te ez kuştim ax ji derdê te lê

Li benda te me yar kanî tu li ku ma
Li hêvya te me yar hedanam nema
Ka rojên berê delal dilberê
Çima te ez hiştim ka bêje min çima

*Helbestvan: M. Riyad Mistefa*

# Ez rûniştim li ber derî

Ez rûniştim li ber derî
Yek çû yek hat li min nêrî

Çavê min neşkest ji tu kesî
Silavek da ji dilê germî

Tu gula sorî li nav pexçî
Ji nav hemû gulan yek reng

Keniya li ser lêva honî
Kirînî ji kezba min anî

Tu gula bexçî vî dilî
Tu awaza jîna minî

Ez Siyabendim tu Xecî
We re dilê min bike geşî

Ez şalol û bilbilim
Bi rengê gula te geşim

Ez Ferhat tu şêrînî
li nav koçeran serbilindî

Xemla te xemlek şêrînî
wek sosin û beybînî

*Helbestvan*
*M. Sîma Ebdulah*



Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوقار فەرمی یە وخودان مولەتە

# 🌹👉WERE DİLBER

EW Dilberek pir şêrîn e
Xiste vî dili, ew evine
Çuka sêbê xweş dixwîne
Ez heyranê, nav şêrîn e

Ew Dîlbera, ya qam qutik
Xweş dimeşe, ew pir sivik
Guharê zêre, ya çar, rêzik
Wê, xerakir, mala xortik

Ew dilber ya nazenîn
Liv şekire, ew xem revîn
Lı ser sîngê, xweşe evîn
Vê birinê, tû bi Kewin

Dilber hat û, meşiya
Wê berê mı dıda çiya
Nava refê, wan zeriya
Werê kêf û, Şahiya

Lı dilberê, bese were,!!
Bes lı dılxe, wan xencera
Jiyan xweş e bı hevre
Dıdım deste, gula zere

Ezû dilber, em bune yek
Çar kulilkê, serê şaxek
Evin lime, sed bınbarek
Ew jıbo me, yek xeyalek

Dilber, bar da Vİ mêli
Te, evin xıste Vİ dili
Lı ser çiya tû, bılbili
Tû şêlêra, ya çar Guli



*Helbestvan*
*M. Mehmet gulspî*



## DUNYA BERÊ

Bila îro bextewarim, bi nav û deng,
Bi zêr-zîvan xemilîme, şoğim û şeng,
Diteyîsim, dimilmilim, ez gulim reng,
Lê dîsa dil, rojên berê maye hesret.

Rojên berê, çira pîroz, emrê nemir,
Ronî vedan, pêşerojê bûne sebir,
Bi hêza nûr, jîyan kirin şîrîn-şekir,
Lê dîsa dil, kesên berê maye hesret.

Kesên berê, malbet dilşad, der-cînartî,
Têr nedibûn, ji hevdu xûşk û biratî,
Gava rûmet, anîm li ser rîya rastî,
Lê dîsa dil, eşqa berê maye hesret.

Eşqa berê, têr-tijî bû bi sadixî,
Tune bû wir, hebsa zêrîn, mirin-saxî,
Li min vebûn dergê here hezar çaxî,
Lê dîsa dil,dema berê maye hesret.

Dema berê, gul-govenda şêne zengîn,
Hizkirîyên dilê bengî, eşqa rengîn,
Qey nezan bûm, nizanibû peyva xemgîn,
Lewma jî dil, dunya berê maye hesret.

***Helbestvan: M. Siltana Memê***



69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە

# Xwe nexapîne?

Gava jiyan hat şeritî
Tazî û rût jê şemitî
Wê çaxê tu bextereş bû
Tar ji deste çû filitî..

Tu bi hêrs bû pir geda bû
Li gora xwe şareza bû
Dinya li ber te fena bû
Navê însan b'ev qemitî..

Ew nav ji bo avahî yê
Bo rûmeta xwedahî yê
Lê te ew nav pêknanî yê
Juyan zû çû rêk pelitî..

Dawî va hat ka te çi kir
Ax û herî bi ser xwe kir
Kuro çima tobe nekir
Kiryarên te jê niqutî..

Çav birçî yo xapandî yo
Tazî hato tazî çû yo
Te hîna dor xwe nedî yo
Tirsa dilê te diziqitî..

Îroj barkir dest vala çû
Bê xatir ji hevala çû
Wek mişkê kor di çala çû
Poşmanî jê diliqitî..



Helbestvan
M. Hasan Kordede



69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوقار فەرمی یە وخودان مولەتە

# EY DILÊ MIN

Çavên wî yarî kor e
Dixape bi her kenî
Evîn li min bar e
Bi bêdengiya her zimanî

Guhên wî yarî kerr e
Fam nake tu gotinî
Sebir li min par e
Bi giraniya her zemanî

Dilê wî yarî zingar e
Lê ne xem e bêwelatî
Bindestî li min zor e
Çare nabe bi tu dermanî

Ey dilê min
Te çi ji yarê kerr û kor
Mîna Mecnun li hawirdor
Mehtap im ez ne Leyla
Dil û ciger ji pola



***Helbestvan***
***M. Mehtap Hacialioğlu***

69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە

# HIŞTEDIKIM

Hiştedikim hiştedikim
Ji terbêjim şermê dikim
Lê lê dînê hela were
Nikarim bê te ezê çi bikim

Wezê bêjim wezê bêjim
Li ser te jî dîn û gêjim
Ez neçarim her nikarim
Bi van derda dil dibirêjim

Ev çend salê evîndarî
Min derbas kir bi hejmarî
Bi zehmetî yara şêrîn
Gelek şevê reş û tarî

Ji te pêve kes tineye
Bike pirsê tu bê tirsî
Eşqa weke min tineye





Helbestvan
M.EKREM OMERÎ

## *JIYAN DEREW*

Pelên dara hewşê
yek bi yek direqisin
li ser kaniya herikbar.
Gula hewşê ya helesor
behna wê ez aşiq kirim.
Dengê pitika dergûşê
şiyar dike jiyanê.
Kalo bi gopalê xwe
derdorê dihijîne.
Dapîr kofiya xwe diedilîne.
Dengê berxik û karikan tê
Ji dûr de distrê bilûra şivan.
Beytikên pîroz ên zêrîn
Dixwînin li ser dara hêşîn.
Hespê bavo hîre hîre.
Dewkula dayo çelqe çelqe.
Teşîya metê rîs dirêse
Tevna etê heqîb dihûne.
Siya mêwa tirî li ser eniya min
nexşên cur bi cur çêdike.
Dengê zarokan tê li kuçeyê
Dilîzin bi darqîtkê, bi heftokê.
Çi difikirim dîsa oy Xwedêyo?
di nav ew qas xweşikiyan de
Dibêjim " Jiyan tu çima derew î ?"



# LAWÊ KURDİM.

Lawê kurdim şarezarim.
Li her qadi weke şerim.
Ji boy azadiye welat .
Gavê paşde na avijim.

Sonda mine axa welat.
Ji boy te be kar û xebat .
Na zivirim na derkevim.
Lawê kurdim dil bi şewat.

Xortê kurdo dika rabe .
Li her qada tu şiyar be.
Êdi bese dem hati ye.
Xew ji mere êdi nabe.

Bila ne mine derenge.
Her çar ali me kelenge.
Ji zimanê xwe dur nebe.
Ew gula mina sê renge.

Dil di xwazê here cengê.
Tolê rakim bi wê rengê
Ma bindesti heta kengê.
Ji bistinim ewê şengê.



Helbestvan
M. Muzaffer Culduz

## EMÊ AVA BİKİN Jİ BO XWE

Dê badin em zend û bendê
Soz bidin hev bo vê çendê
Bibin heval heta hindê
Da yekbakin armancekî
Azad bikin evê rindê

Li nezanyê dawî bînin
Ew tariyê bo me tînin
Tim bi şer in rik û kînin
Şiyar bikin kurmancekî
Bes kul û derda biçînin

Dê avakin em jiyanê
Bi xemlênin em dîwanê
Qesr û qonax bi seyranê
Keç û xorta bi tacekî
Bigrin govend û dîlanê

Li ser birca rakin felat
Bi çikînin ala welat
Emê welat bikin xelat
Gel bi zimankin carekî
Bi zanistê derxin celat

Bi çînin baxçê bostana
Gul û nêrgiz li bîstana
Kal û pîr mîna hostana
Pez û reza bi karekî
Ji dîrokê ji destana.



Helbestvan
M. Bişar Baran/17 07 2024



Min dî li ser warê şêra
Kund û qiralk û qertela
Min dî li ser dara gula
Sîsalk li şûna bilbila
Bi nav û nîşana wilo eş û azare lo dilo
Bi kotek û çekê giran
Êrîş dane gula delal
Cawekî reş weke qitran
Ber dane ser dara gula
Çi êşek pîs û bi jan avêtine dil me lo
Bi av û xwîna azerî
Me av dida gula zerî
Me dayê her tiştê giran
Ta bibe bûk û bigye ciwan
Qurmiçandn negiya serî berbat kirn baxê me lo
Ez di xwînim bi rengî
Li cîhan hemî bû dengî
Ruhnî me da şeva tarî
Li me vegerya bi zirarî
Ji mejîyê wanî gemarî ev çi bext û wijdane kuro
Aştî xwazin em
Narin kesî bi fût û fen
Mafê xwe ezê bistînim
Çavê te yek di kennê û di girî
Bext û wijdanê te tuneyi ev war warê bav û kalê mine kuro

*Helbestvan*
*M. Mûsa Ahmed*

Helbestvanê kurd
M. Simoyê Şemo
1967

## PAYÎZ

Belgê darê gi zerbûn,
Hêdî - hêdî hatine xar,
Quling ber bi berîyê çûn,
Av zelal bû karibar.

Ji kulîlkê belg weşîyan,
Bere - bere ma çopik,
Xemla gulê tişt nema,
Neman gîha û gupik.

Mî nakele, deng birî,
Berx zûda wê namije,
Çivîk hêlînê firî,
Çîya kurk dighoyze .

Ji gedûka çîya, xezal,
Hate berbi arana,
Sekinî tirs, ker û lal,
Tim dûrî nêçîrvana.

Gur tenê çîya hate xar,
Çevî guhêra kêrî,
Şevê paîzêye sar,
Kanên qe têne sêrî.

Şêr qefes xwe qalinkir,
Pûrta ser xwe kir kulav,
Qarîtkê bez berev kir,
Cewa zirav kirin av.

Tebîyet îdî radizê,
Dilda miraz, gul, bahar,
Ku nebîne rû dinê,
Çi dikin berf, baê har.

Lê baharê dîsa bê,
Ça ev pêncî bahare,
Deste kulîlk wê bidê,
Cawa hercar, her yara.



KIRASÊ MIRINÊ NAQETE

Hest û helbest li min fûrya ey welat
Jiyan li min bûye dojeh bê qinyat
Dîyarya min bextê reşe bû xelat
Firmêskên min çilmisand gul û nebat

Feryad fîgan dikim li ser goristan
Min xem û kul kirye weke dibistan
Nikarim rabim ji nav pî û destan
Xeniqîm di nav van awaz û hestan

Dikim nakim heznakim ji vê jînê
Qalik girtîye xwîn te ji birînê
Wek Ehmedê Xanî ji ber evînê
Mîna beko û eşqa Mem û Zînê

Dil helîya ez mam li ber dîwara
Min welat hişt,negihaştim siwara
Xeyal mirin,ez şad nebûm tu cara
Pêşwazî kir li min gazî hewara

Qet nebêjin tu lawaz û melûle
Reş bûye li min ev hinav û dile
Kêm endamim tune min dest û mile
Xewn û xeyal herdem çavên min şile

Bêjin nobetdaro,çima xew na yê
Bûm rêheval li gel baran û ba yê
Nav berf û boranê ketime ta yê
Şevên reş û dirêj get sibe na yê

Ne sazbend û hunermend û hozanim
Çilmisî wek gula nava rezanim
Bextê reş li Araratê zozanim
Ji bîr kirye navê yarê nizanim.



*Helbestvan: M. Tahsîn Aktaş*

69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە

# Ez çi bêjim xanim?



Helbestvan
M. Bengîn Yûsif

Ez çi bi bêjim ku ez bedewiya te vebêjim?
Roja min tu naskir ji wê rojê ez mest û gêjim
Tîp winda bûn û gotin belav bûn nize çi bêjim?
Helbest bê hevbend ma ez şaş bûm niza çi birîsim?

Delal Çavên te ez bi tîrên evînê reşandim
Kenê şêrîn dilê min şa kir ez ji nû vejandim
Bejina tey şilik hişê min bir û ez kewandim
Ez bûm mîna dîna û li çola te ez gerandim

Û lêvên tey gezo ji wan di barê ez tî kirim
Û pêsîra te kaniya jîniya ez mest kirim
Biskên mîna zafarana hindê ez bê hiş kirim
Ez çi bibêjim ku ez çelenkiya te vebêjim?

Te ez girêdam ez bûm girtîkihê evîna te
Bûm bend û êsîrê kelepçeyên azweriyê te
Evîndarê azadiyê bûm ez bûm girtiyê te
Ez çi bêjim xanim?
bûm evîndar û dîdarê te



Bi çi zimanê ez bikim pesnê qeşengiya te?
Ferhengên cîhanê têr nakin ez bikim pesnê te
Ez nû di helbestê de me ez çi vebêjim ser te?
Ez çi bêjim xanim? Ta diyarkim eşqa xwe bo te

69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە



Helbestvan
M. Rojhilat Raperin
Helbest: Firişte mamend

ji şûna xwe hildim heger
ne bi bawer ne jî gewher
Ezê tenê xem bibim ser
Eger jî kûr eger jî kor

ji wê gava ku siya min
Dike hewar hêvîya min
êvar şîn tên ser riya min
eger jî  zû eger jî zor

heger birmirim nebûna min
bibe nîşan li şûna min
Şîn be gul û beybûna min
Eger tu dûr xem jî derdor

Dused Jan can de berdane
temen dildarê derdan e
Ji ber evîn sed can mane
ger ser li jêr sed dil li jor

Nekim gilîya dildaran
Bi wan têlan dilê wêran
Bi wan poran pêl da yaran
Heger bir pêl heger bir por

Ji şûna jîn min can da yar
Bi sed malan mame bê war
Ji jiyanê mame bê par
Min Dil da şûr guh mam bê şor



Bêjine bav û dê...
Şervan nema tê
Çek hildaye û çûye cengê
Tevlî refên tekoşînê
û şoreşgerên serxetê

Bêjine bav û dê...
Gulebaranê dest pê kiriye
ji berbanga vê sibê
Gur kom bûne li dorê
Şervan bi tenê di nava berfê
de maye asê

Yek gule li sîng xistine
û du li piştê
Xwîna germ gihiştiye çokê
Sor bûye rengê berfê
Şervan nema deng jê tê
Dengê ewrên bombebaranê
ji Geliyê Zîlan tê

Bêjine bav û dê...
Çar lehengên dozê
Sond xwarin bi navê Xwedê,
ku roja tolhildanê
di demek nêz de tê

Bêjine Bûka xemilandî
li ser hespê Zavayê
Te nema tê
Çû serdana Xwedê

*Helbestvan*
*M. Kawa Nûrî Seydê*



69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوقار فەرمی یه وخودان مولەته



# سأحزم طفولتي وأرحل

.........................

سأحزمُ طفولَتي قَبل....
انْ تسقط شَذرات النور
مِن الأمس.....
وتتساقط إمنياتي.....
كشذى الياسمين....
سأغزل على خد القمر.....
احلامي......
وأنقشها ليولد النور.....
وأدون اسمي....
في صفحات السماء...
سأرحلُ بطفولتي....
قبل رحيل ومضات
السَرور....
قبل أن يقتلهُ النِسيان.....
ذاتَ يوم....

***********

في يساري حِكاية حَياة....
كالنرجِس وشقائِق النعمان...
وفي يميني أنفاس....
طفلةِ تبوح.....
بأجمل الدُعاء.....
بتراتِيل الانبياء....
وحديث الصديقين.....
سأحزمُ طفولتي وأرحل
قبلَ أن يسرق المِيلاد.....
اجمل اللحظات.....
سالتقي عند حافة النهرِ....
بأجمل الفراشات والزهرِ
بكل الألوان.....
وأشعلُ قناديل تَشيع....
البَهجة في منازِل الفقرَاء....
كوجه طفلةِ تصطاد
الشّمس.....
في الحقول الخالية
في غابات الكاردينيا والليكِ....
حيثُ تتوسد بعبق....
سِحر التكوين الازلي.....
واختفي كأطفال.....
الغابة الضائعة....
ازور بيت كلهُ من
الحلوى....
واصعدُ أشجار
لا اسماءَ لها...
وانقشُ الحروف على
الجذوع....
والهو مع الطيور
واطير كفراشة الربيع..
قبل أن يسرق الميلاد..
اجمل اللحظات.....
سأحزم طفولتي وأرحل



*بقلم الشاعرة*
*أ. كوردستان يوسف*

69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



## على سبل الرصيد

--------------------------

يا ..من
تفوه بالحياة
وتفوتك الحياة
كالحروب..
على صهوة اللال
بين مضارب النرد
وظمى التعلة باليعاليل...!
في لجيج الشكوة بالعناء والغناء...؟!
يا..من
تفوه بالحياة
وتفوتك الحياة
كالحب..
في صحوة الرهام..!
وحده..
وحده الصفصاف
زاهد ..هامد ..هامل..
التآويل في توخي وحي السماء..؟!
يا ..من
تفوه بالحياة
وتفوتك الحياة
كآمال..
في صد صدى الرمال
إني "انا" الصفصاف
صلبت نفسي في إنبجاسي ..!
على اغصاني..
المدللة من معارج المزن و الغمام ..؟!

بقلم الشاعر
أ. شكري شيخ نبي

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة)





نفقٌ بلا نهاية
تضيئه قناديلٌ عمياء
خطوات الفراق ..!!

هنااااك على بعد نظرة
يغفو الزمن في حضن اللحظة
بداية نهاية ..!!

هزةٌ مدوّيةٌ في قاع القلب
تنهي الصراع العقيم بين الذات و الذات
اعتراف الحقيقة ..!!

حروف متشابكة
تقتلع جذور الأمل من باطن النفس
براعة  قلم ..!!

دموع جافة
تهرب من السقوط الي وجع النجاة
جبروث كبرياء ..!!

وشمٌ على بياض الروح
تذكر بماضي الياسمين
صفعة وفاء ....!!!

بقلم الشاعرة
أ. شيرين سعدو

أغمرهُ بالملحِ جرحكَ
تماماً كقهوتها إذ تُدلَقُ
في جموحِ الأكريليك
ودعها تتجلى في الإكتمال
لؤلؤةً تموجُ بالضوءِ
على نحرِ بحرٍ
أو كطيفِ قزحيّ
شعَّ في أفقٍ بَعيد
أتذكر أيها الغريب
إذ كنت تنتظرها
فإذا ما أقبلتْ
أقبل البابونجُ واليانسون
وكلّكَ يَنشطِر
لا يدري إيّانَ يكونُ إليها الهروب
إذ كنتَ تسخطُ في أصابعِكَ البلهاء
أمام مكتبة مديوانية
تقفُ ممسوساً وتزوغُ عيناكَ
نهمًا تمسحُ الواجهةَ بلهاثِ حدقتيك
عبثاً لعلّكَ تعثرَ عليها في عنوان
فأمسيتَ حزيناً
كحكايةٍ مخزقةٍ وَجوم
كأغنيةٍ كورديّة
فرّت من جحيم الكيمياءِ
إلى متنِ غيمةٍ
لتودعَ مأساتَها في جعبةِ سَماء
وأمسيتَ تتبعُ عينيها أيها الغريب
وعيناها أمستا
نجمتينِ إليكَ هاربتين
من مجرّةِ اللامنطق لتضيئانِ ليلاً
ما كانَ ليغادر
تمهرانِ صكاً وَتَني الإمضاءِ
وتشعلانِ شموعاً لقداديس الشعار
فتشتعل بوهمٍ لا يتقنُ التملُّصَ
من شدقَي مرآةٍ نِصف
مكسورةٍ
لتبدوَ كَذبةٍ كافِرة
صرّةُ أسرارٍ مدفونةٍ

في طيّاتِ الصمتِ الثقيل
ما صادفت ريحاً حملت أجنحةَ كلِّ الطيورِ المهاجرة
غداها ..
في لهفةٍ ثَعت
حَبَث
خلفَ دِفتَي حَديد
سقسقةٌ أسمعَتكَ خطواتَها
إذا ما عَبرت الجسرَين
فيغدو النهرُ الضَّحلُ
فيضاً يفترسهُ الحنين
يغدو ريشةً ترسمُ قطرةَ ندىً
فوقَ بُتَيلةِ ياسمين
أو يزكيها كرائحةِ التراب
بُعيدَ لثمةِ مَطر
أيها الغريب
أصابعُكَ البلهاءُ ما عرفتِ الرهابَ
فَداهِم
وإنْ ألقيتَ في فضائها غرقا
فالحب قيدٌ فاخر
والوحدةُ حريّةٌ موحشة
فما تفعلُ بعدُ بروحٍ تشظّت
والفاجعةُ ما تنفكُّ تلذعُ عينيك
وتدمغُ صدغيكَ بحبرِ الإقتراعِ الأزرق
قل لي إذن
أمازلتَ تهفو لسرابٍ يتراقصُ فوقَ حَلَمَتَي قامشلو
الساهيتينِ عن صَخَبِ ما برِحَ يَعتريك
أمازلتَ تبحثُ عن ماءٍ
تاهَ عن أخاديدِ العطش
أمازلتَ هناك تتمرغُ
في عفيرِجامحٍ بالأسى
غداةَ سقوط
وتتمردُ أن ترتدَّ من المُطلَقِ
إلى النسبيِّ الموجع
ثم لتكثرَ من أسئلةٍ تَنكش البطينينِ والأذينتينِ معا
أيها الغريب
ها قد هوَيتَ في جبِّ الوجعِ

من يحملُ فأساً ليفتحَ لك ثغرة
و إذ قلتَ
الحياةُ والموتُ وجهانِ للفناءِ
فهل امرأة جُبِلَت من حلوى وزهور
عبثت بالبديهة
وأمسكت بحلقومِ القصائد
للذبحِ تهبهن كأضحياتِ عيد
قل لي إذن
كيف لـ "عوليسَ" أن يشقُّ متنَ الموجِ
ليعودَ إلى " إيثاكا "
إلى بلادٍ أوقدت فيهِ جذوةَ ذاكرةٍ
تمرَّدت على النِسيان
فاعتادَ أن يَهرعَ
كلّما بَدَت أعلى ساريةٍ تقبلُ من آخر الماء
ثم تصلَ خاويةً
لشاطيء شترالزوند الباردة
متهكمةً ترفعُ إصبعَها الوسطى
الخيباتُ كثيرةٌ..
والإنتظارُ أطولُ المسافات.



الشاعر
أ. فرهاد دريعي
ألمانيا

69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

## قلب وحيد وليلة في بستان الرمان

١

قرّرتُ
أن أنقلَ كل الأسماكِ الصغيرة الى بحر عينيك
وأُخبئ كلّ عصافيرِ الاشجارِ وسطوحَ المنازل
في حجر طفولتي ..
إذا اختفى قلبي يوماً
أين تخبئ عشقي

٢

قلبكِ أنتِ فضاءٌ وحيدٌ
ومذ خلقَ عيونُهُ تُمطرُ دموعاً
ولم تستطع اِحدى السحابات
أن تملكهُ ولو لمرةٍ واحدة

٣

قلبكِ أنتِ حزنُ
منذُ أن امتلأ بضوء العشقِ
سكبَ دموع السعادة
مع ذلك لم يسكر
ولو لمرةٍ واحدةٍ بشرابِ شفتيّ ..
وفي بعضِ الاحيانِ
قلبكِ نجمةٌ حزينةٌ
لم يبقَ عشقُها للأرض
واحيانا تصبحُ شجرةً سوداء
لتسقِطَ زهرةَ الشباب

٤

الى اين تطيرُ بأجنحتك التعبَة
تعال اليّ؛ كي أضيءَ لك فانوسا
لتُعطي شوقا لقلبك
اريدك أن تضحك معي
ولا أريدك أن تبكي على ما مضى

٥

أنا أحبُّ دوما
أن تزهرَ بستاني كلَّ يومٍ
بزهرةٍ جديدة .. لتضعيها على شعرك
كي يبقى وطني شباب دائم ..
وتهبُ نسمة عشقٍ باردة في وجهك
عندها أنا أيضا آتي لقلبي
بحضنٍ من الاوراقِ، مضطربةٌ ومستاءة

شعر: "أ. كزال ابراهيم خدر
ترجمة: "نسرين محمد غلام



في خاصرة الذكرى
...وكم من الأحاسيس تسربت
في حديقة فرحي وآلامي.
هنا كنا نمسك بأيادي أطفالنا ونتمشور،
وهناك.. نمدّ جريدة أحملها معي بساطًا
وتحت ظل تلك الشجرة الوارفة
نتقاسم الصندويشات،
تفصفصين البزر
وأنا أخرج علبة دخاني...
يحيط بنا الاخضرار والنقاء
وتسورني عيناكِ...
كلونٍ للجمال
في مرآة الطبيعة.
لكنّ المكان لم يَعُد كما كان...
الشجرة ما زالت وارفة،
والمقعد ذاته...
لكنه صار أكثر وحدةً منّي.
ظللكِ غاب،
ورائحة الضحك تاهت عن ذاكرتي.
ما عدتُ أمدّ الجريدة،
ولا أفتح العلبة...
أخشى أن أجالس وهمًا.
أخشى أن أناديكِ،
فيسمعني العابرون ولا يسمعني الغائب.
أجلس في الزاوية ذاتها،
وأطيل النظر إلى الغصن الذي كنتِ تلمسينه.
أتمنى لو يعود الوقت
ويعود دفء يديكِ...
لكنّ الريح تمرّ،
تبعثر أوراق الذاكرة
وتهمس لي:
"هي مرّت من هنا... ثم ذهبت إلى الأبد."
لكن المكان لم يَعُد كما كان...
الشجرة ما زالت وارفة،
والمقعد ما زال يئنّ من خشبٍ تقادم عليه الزمن،
لكن ظللكِ... غاب.
غابت الضحكات،
وتحوّلت رائحة السندويش إلى خرافة،
وصوتكِ... لم يعُد يتردّد
إلا في داخلي.
أجلس في نفس الزاوية،
أمدّ الجريدة،
وأضع بجانبي علبة الدخان
علّ طيفكِ يجلس،
علّ يدكِ تمتدّ كما كانت.
لكن الريح تمرّ،
وتبعثر أوراق الذاكرة،
وتهمس في أذني:
"هي مرّت من هنا...
ثم ذهبت إلى الأبد".

بقلم الشاعر
أ. ماهين شيخاني



انفرط ذات نهار....

وأنا أجمَعُ كلَّ تثاؤباتِ الفجر،
جسدٌ بخيطين،
ارتميا عند الناصية،
كلاهما من خيالِ محاربٍ،
ابتلعا كلَّ الإبر،
والثقوبُ نزيفٌ تسرده
دميةٌ صمّاء.

راحت تُحدِّدُ المواعيد،
تحملُ جذوةً من نار،
فجوةٌ صمّاءُ في كفن.

لا عيونَ لها، ولا جدائل،
استطالتْ بعدَها طُرُقاتُها الحانية
على كفِّ يدي،
زرقاءُ، باهتٌ لونُها،
تستترُ تحت أعينٍ مرتابة،
مزيجُ تنبّؤاتِها الحنظليّة
ازدحم بدمي،
كفرائسَ ذاعَ صيتُها
عند أولِ وابلٍ من مطر.

يخبر العائدين بنشوةِ انتصار،
تتعلّقُ بألوانِ قوسِ قزح.

قريبًا... أو بعيدًا،
في الأمس... وفي الغد،
حينَ انفرطَ ذاتَ نهار...



الشاعره
أ. رجاء الغانمي / العراق

69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

## بيث بيتهوفن... حينَ يسكنُ الخلودُ في الجدران

في زقاقٍ ضيّقٍ من فيينا،
يتنفسُ بيتٌ قديمٌ من حجرٍ وصمت،
بيتٌ لا يُرى بعينِ العابر،
بل يُلمَسُ بالقلبِ حينَ يحنّ للعظمة.

هنا عاشَ بيتهوفن... لا، بل هنا أقامَ الخلود.
بين جدرانٍ تُوشوشُ الريحَ بالأسرار،
ونوافذَ تنظرُ لا إلى الشارع،
بل إلى داخلِ الروح.

في الغرفةِ الضيقة، حيثُ لا يُسمَعُ الصوت،
وُلدَت أعظمُ السمفونيات،
كأنَ الصمتَ قد خضعَ له،
وكأنّ الكونَ بأكملِهِ أنصتَ
لرجلٍ لا يسمع.

آهٍ يا بيتهوفن، يا ناسكَ النغمة،
كيف جعلتَ من الخشبِ والطينِ معبداً؟
وكيف نثرتَ شظايا قلبكَ على المفاتيح،
فأزهرت موسيقى؟

في بيتك، يتدلّى الضوءُ من السقفِ كأنّه نغمة،
والغبارُ على البيانو ليس تراباً، بل أثرُ حضور،
الكرسيُّ لا يزالُ يحتفظُ بانحناءةِ ظهرك،
والساعةُ القديمةُ لا تدقّ... احتراماً للزمن الذي سكنته.

كل شيءٍ هنا حيٌّ دون حياة:
قلمك اليابس، أوراقُ النوتةِ المصفّرة،
مظلّتك الصامتةُ في الزاوية،
وحتى كأسُ الماء... كأنّه ينتظرُ عزفاً جديداً.

بيتك، يا ابنَ الألم،
أشبهُ بكهفِ أفلاطوني،
حيثُ الظلالُ تعزفُ الحقيقة،
وحيثُ الموسيقى ليست فناً... بل نجاة.

أكنتَ حين تمشي في ممراته،
تشعرُ بأنّك تحاورُ القدر؟
أم أنّ القدرَ كان يتسللُ إلى غرفتك،
يسرقُ بعضاً من عبقريّتك،
ويغادرُ على رؤوسِ أنغامك؟

في سقفِ هذا البيت،
تنامُ الموسيقى كطفلٍ شقي،
وفي زواياه،
تُقيمُ المعاني التي لم تُكتب بعد.

يا بيتهوفن،
حينَ نزورُ بيتك اليوم،
لا نزورُ حجارةً أو متحفاً،
بل ندخلُ إلى جوفِ إنسان،
صاغَ من وجعهِ لحنَ الحياة،
وزرعَ في الخلودِ عنوانه.

الشاعر
أ. عبد العزيز قره حسن



Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
69
10/6/2025
گوقار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



الشاعرة
أ. لينا حسين

أشتقتُ لكَ
أختزلتُ عشقاً
بِشوقٍ لا تنتهي
وهبتُ الروحَ لِلروح
أشتقتُ لكَ
شرارةٌ تتطاير
لتُضيءَ ليالي البُعد
وتُدفئَ قلوباً
أرهقتها الحنين
أشتقتُ لكَ
دواءً يُشفي
العليل بِالهوى
تُخدِرُ أوجاعَ الغياب
أشتقتُ لكَ
أحنً إليكَ
بِعددِ أوراقِ الشجر
حنينٌ يفوقُ القدر
أشتقتُ لكَ
كـ أرضٍ عطشى
لِحباتِ المطر
تُروي صحارى الوجع
أشتقتُ لكَ
أُريدُ رؤية عيناكَ
لِيهدأَ جنون العشقِ
أشتقتُ لكَ...لكَ أشتقتُ
رُغماً عني أشتاقُ لكَ

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



الشاعر
أ. احمد ملا يحيى

## 🌻 تأمل 🌹

حبيبتي:
أتذاهن معك،
تذاهن الصوفية مع المطلق،
التاويو مع التاو والغسق،
الوثنيو مع الصنم،
والفلكي مع المدارات والقمر.
استلهم منك آيات
الحب والقدر.
وأستوحي المصير
ومستقبل البشر.
إنهم إعتمدوا وإنتهجوا
فتن وإحن الشرائع
قوانين ودساتير للبشر.
فهم الى الزوال والدمار
وعتمة القبر والدار.
فا العزير إبن الله،
ولا مكان للمسلم والنصارى الأشر.
والمسيح ابن الله
والحساب أدهى وأمر.
والهلال يحطم النجمة،
والصليب،
وباقي الطوائف كفر أغر.
جل أوطانهم وبلادهم
مأوى للفسق والشر.
فلا دين يجمعهم سوى
دين الحب، دينا للبشر.
كما قال المحي الدين الأكبر:
دينا :مرعا لغزلان،
وبيتا لأوثان،
وألواح توراة،
وتقاديس أناجيل،
وأفستا يزدان،
ومصاحف قرآن.
منبعهم الواحد الديان
حاكم يوم الدين والميزان.

69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
گوڤار فەرمی یه وخودان مولەته (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

"في الذكرى، تُزهِر الغصة

عامٌ مضى
ولا تزالين تجلسين في قلبي
كغيمةٍ لم تُمطر
كأغنيةٍ نسيتُ اسمها
لكنّ لحنها ما زال يسرقني كل مساء.

أختي...
هل تسمعين هذا الصمت؟
إنه يبكيك
كلما عبرتُ أمام صورتكِ
كلما ناديتُكِ ولم يجبني إلا الجدار.

في الذكرى
يشتدّ الشتاء في روحي
كأن الغياب لا يكتفي بأن يأخذ الجسد
بل ينهش الحنين حتى العظم

كنتِ تقولين:
"ما زال في العمر فسحةٌ للحلم
فماذا عن حلمي بك؟
هل تسمح السماء أن أراكِ مرةً في المنام؟
ولو صدفة
ولو خاطفًا كغمضةِ حنين

أيتها التي كانت حضني حين يضيق العالم



أين دفنتِ صوتكِ؟
لماذا لم تأخذي حزني معكِ؟
لماذا تركتِني هشّة
كأنفاس يتيم في بردٍ طويل؟

يقولون: "الموت راحة
لكن من قال إننا نحن الأحياء لا نتألم أكثر؟
من قال إن الفقد لا يواصل موته فينا؟
أنا أنزفكِ كل ليلة
كما لو أن الموت حدث الآن
ولا يزال يحدث...

يا وردتي التي ذبلت قبل أوانها
أيتها النبض الذي سكن القلب واختفى
كل عامٍ وذكراكِ توجعني
وتعلّمني كيف يكون الحب بعد الرحيل
وكيف يكون القلب مقبرةً بلا شاهد.



الشاعره
أ. جنار أحمد

69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye گوقار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة)

# لو تعلمينَ

بقلم الشاعر: أ. شيار آلياني



لو تعلمين معنى الحبّ
ولوعة الحنين بعذاب الفراق والسنين
ماذا عمل فينا
والله ما كنتِ تجافينا
لو تعلمينِ بعذاب الحب
وصدى أنيني وآهاتي
وحرارة اشتياقي
فلنْ تُعامليني بجفاء
لو تعلمين كم أشتاق لقياكِ !
وحنين الغربة يزيدني شوقاً
وناراً بين ضلوعي
ما كنتِ تجافينَني
لو تعلمين أنَّ طيفكِ لا يفارقني
الشوق والحنين أحرقني
بانتظار لقياكِ
ما كنتِ تجافينَني
فقد طالَ اللقاء
اقتربي أيتها الحسناء
فبدونك الحياة سوداء
وإلى متى الانتظار ؟
لنعيشَ في السراب
ونتحملَ العذاب
تعالي... لم هذا الصمت والابتعاد ؟
إلى صدركِ ضميني
وبلهيب عشقكِ اكويني
وبعبير أزهار ربيعكِ اورويني



اكتب يـا قلـم ..
انزفِ الآه وَ الألـم
اطلق عنـانَ الحزنِ
وَ الشجن
حطـم قيودَ الممنوعِ، تحرر
اكتب ..
كيفَ للبشري أنْ يظلـمَ
أخـاهُ الإنسـان
أقربـاءٌ
أخوةٌ بـ الدمِ
أصدقـاءٌ
أحبـة
انزف يـا قلـمُ وَ اجعل نزيفكَ
يتخطى الحدودَ وَ البلدان
ليصلَ لأعماقِ البشري الأصمِ
علـهُ يصحو
وَ يشعرَ بـألـمِ أخيـهِ
لـ يتحولَ ..
مِنْ مجردِ بشريٍ لإنســـان
يحملُ قلبـاً رحيمـاً وَ ضميراً
يمسي الكونُ جنـةً مِنَ الجِنـان .

بقلم الشاعرة: أ. نبيهة حسين

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



بقلم الشاعر
أ. إدريس جيدر

على مقعد الأمل.....
على مقعد قديـم
بقايا حديث لم يمت
مازال عطره يملأ المكان
ورقة نُقشت بدمع
فضل المكوث زمناً
وردة حفرت رسمها
على طرف الأيسر
من كُحليةِ المعقد
مازلت أتذكر المكان
و كيف جمد آخر الكلام
و في فمي قصيدة
خرساء لم تولد بعد
شوق و دمعة و ياسمين
رسالة كأنها شبه فارغة
تفسر كل الارتحال
لم يمت حديثنا فما زال
عطره يملأ المكان
مازلت أتذكر تلك الاعذار
في وَداعنا الأخيــر
يقظةٌ توقف الدهشة
لمنظر لهفة قديمة للانتظار
لتولد فراشات الأمل
في كل لحظة اقف فيها
بين احضان الزمن
بلهفة تُكرَرُ كل يوم
بعطر الياسمين
لأكتب الحروف الأخيرة
من رواية لا تنتهي ...

69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



إلى أي أرض
ليتك تدري
اي دم في
عروقي
صار يجري
عن انفاسك
بالضلوع تسري
ضعي كل
الهرم فوق قلبي
لتدفني كل اشجاني وخبري
وزيديني من ترابك بحجر
فلن تقتلي حبك
بصدري بيعت
خلاخيل القرية
يا جاهين
وعطر الأرض
لسه.. بدري
عرق ومحراث
وكؤوس
مر صبري
لم تعد تحضن
الأرض الا قبري
يا ملكة الروح
يا عرائس النيل
تفدي
حقول فلاح
مصري
هاتي من الاول
عمري
وافرشي
عيشا وملحا
لا يخون ارضي
وشعري

بقلم الاديبة والشاعرة
أ. ناجية رمضاني
تونس

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە

## أنا الخطَّاءُ

أنا الخطَّاءُ توَّابٌ لربِّي
أنا العبدُ الفقيرُ وبِيَ معاصي

أنا الجُنديُّ في حربي وسِلمي
ولي هدفٌ بقولي أو مِراسي

كُروبٌ لا تُبارحني بليلٍ
وتُرسلُ في النَّهار بكلِّ قاسي

وتبعثني عتيقاً لا جديداً
ولا أحدٌ يراني أو يواسي

فأغمسُ لُقمتي في قلبِ صدري
وأُخرِجها كعودِ وهو عاسي

أراقبُ نجمةً وقفتْ طويلاً
على ساقٍ بها ألَقٌ لِماسِ

فأسألها بعزَّةِ من برانا
وشدَّ جسومنا شدَّ النُّحاسِ

إلهي في خُطايا الذَّنبُ طنٌّ
وقد بلغَ السَّماءَ مع الرَّواسي

وحالي زادهُ الفقرُ انتكاساً
كأنِّي صخرةٌ تحتاجُ آسي

ودَينٌ أيُّ دَينٍ أينَ أمضي
فيا خجلي لِغُرمٍ ذي مآسي

ودَيْنٌ للعبادِ له رؤوسٌ
زواياها كثُعبانِ الدِّقَاسِ

فأنظرُ يمنةً فأرى يباباً
وألمحُ يسرةً عبداً يُقاسي

وأمشي في الطَّريقِ إلى مصيري
لأهربَ للإناسِ من الأناسِ

فيا جبريلُ أبلغْ من براني
بأنِّي عبدهُ أحتاجُ باسي

فنظرتُهُ كنورٍ جلَّ عتمي
وتسخيرٌ أعادَ إليَّ راسي

إلهي قد فررتُ إليكَ فاسقي
جفافي من عطاكَ ومَلِّ كاسي

فمن لي غيرُ جودكَ يا حبيبي
إذا دقَّ الشَّقاءُ عَلَيَّ فاسي



بقلم الشاعر
أ. تمّام طاهر سلوم الخزاعي / سوريا



# نصف حلم

لا أريد نصف حلم
ولا أريد أن أكون خاطرة
بذهنك
تجول بى بساحات الأحلام
تُلبسنى رداء العشق للحظات
أذوب بين يديك تسحقني
الهمسات
وأفيق من غفلتي لأجدك قد
هجرتني

فأنا لا أقبل بوجودى ضمن
الحاويات
إن لم أكون عشقك الأبدى
فدعنى أراك حلماً كاملاً
بخيالي
ودعني وأحلامي التى تملاء
وجداني وتجعلني سيدة
قلبك



الشاعرة
أ. وفاء صابر

باحات النفاق
لا شيء يثمر في هذا الزمان سوى النفاق ...

لا درب يسير بأتجاه النجاة سوى
ذاك السياق ...

إن أثمر الصدق يوما فالرياء يخفيه
من الآفاق

هم قالوا للآلهة أن المطر للغيمة
ولد عاق

فيسقط النجم آفلا من السماء
من الاعماق

جاءت سكرةً ألهبت أضلعي ...
صنعت الشقاق

بالنفاق تستطيع ان تقنع الفلاح بأن العنب دراق ...

وان تصنع لليل قوس قزح على
الجبين كاللصاق ...

أستفيق من كابوس لازمني لزوم
المنافق للرفاق ...

لا شيء يثمر في هذا الزمان
سوى النفاق
قلبي باحات ورد ... كل يوم يذبل
ورد العناق
قلبي باقات ورد ... شهد من بتلات
زهر العشاق ....

*الشاعر الملكي*
*أ. محمد جميل عمر*





ولماذا ترحلون مادام الوطن باق..
كل الاشياء على حالها.
الحصى. والقرميد
وشجيرات الياسمين والنرجس
وغيوم السماء اصبحت
لاتمطر ولا تصرخ
وجدران منازلنا تنزف
وهاجرت الطيور من اغصان اشجارنا
وبقيت بيادر القمح تتقهقر
واشجار الزيزفون تبحث ذكريات العشاق
والامهات تترقبن كل الدروب
والليل ماعاد يحمل الينا
همسات العشاق..
كل الدروب مكتظة بالهياكل الادمية
تبحث عن حلمها
عن ذاتها الضائعة بين اشواك الخرنوب
يامواكب الهجران
انظروا الى اشجار التين والزيتون
صامدة لن ترحل
ولماذا ترحلون والوطن باق

الشاعر
د. إبراهيم بشار قاسم

69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە



## ١ صَمْتُ العِتَابِ

سَتُخرِجُكَ كَلِمَاتِي تَشْرَحُ مَدَاهُ
الحُبُّ كَانَ فِي قَلْبِي لَكِ مَكنُونُ

تَندَمِينَ جَرَحْتِنِي غَضَبُ إحْسَاسُكِ
فَسَمَّانِي يَا يَا مُخْتَلٌّ يَا مَجْنُونُ

سَهَرٌ طَوِيلٌ لَيَالِيَ وَحِيدٌ زَمْهَرِيرٌ
و دِفْءُ الأحْضَانِ غَادَرَتْ مَعَكَ

دَوَاوِينُ الشِّعْرِ لَنْ تَقْوَى وَصْفِي
يَا رَفِيقَةَ العُمْرِ كَمْ كُنْتُ بِكِ مَفْتُونُ

---



## ٢ سُلْطَانَتِي

مَا الَّذِي تُرِيدِينَهُ مِنِّي؟
سَحْقَ لِسَانِي
أَمْ إِكْمَامَ فَمِي؟
أَمْ مَقَالَةً أُطِيلُ الشرح فِيهَا ؟
أَرْجُوكِ، اغْفِرِي
اقْبَلِي نَدَمِي!
لَا ذَاكَ وَلَا ذَا بِهِ يُسْتَهَانُ!
لكن ارجوكِ تَذَكَّرِي هَيْبَتَكِ
جَعَلَتْكِ تَسْرِينَ بِدَمِي!
...............

أ. طَارِق بَابَان
كُوردِسْتَانِ الْعِرَاقِ

## هـايـكو

١-
شعاع الضوء
على الحصى الملونة
أثار الخطوات

٢-
أول الربيع
بين زهور اللوز
فراشة بيضاء

٣-
قمر الربيع
الهالة تتوسع
البركة ساكنة

٤-
شقائق النعمان
تمر الفراشات من أمامي
أحدق في السماء

٥-
الزيز
يعيد نفس الأغنية
من الصيف الماضي

٦-
ليلة باردة
على السرير تذبل
أحلام الأمس

٧-
مقعد الحديقة
تغفو عليها
آثار المتعبين

٨-
غصن يابس
تغريدة واحدة
تعيد الذاكرة

٩-
حديقة المنزل
أزرع وروداً
لا أعرف لونها!

١٠-
مع الريح
تذهب بعيداً
الأوراق الصفراء

١١-
كل ما تبقى
من الغابة الكبيرة
سنديانة صغيرة

١٢-
طريق جبلي
تلك السوسنات
لمَن تلوح ؟

١٣-
قديستنا
تموت بصمت
شجرة الزيتون

بقلم الشاعر
أ. عبدالرحمن عبدو



Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
گوقار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

مقالات



الأديب: أ. هاشم مراد

1/2

## ..اوراق متناثره.. مكانة المرأة الكوردية.

رغم الظروف والصعوبات، إحتلت المرأة الكوردية مكانة خاصة، في غالبية مجتماتها، بالرغم من ان تلك المجتمعات كانت تخضع لقوانين ودساتير لا تلبي، طموحاتها، وحقوقها، ومازال الكثير منها لا تنصف المرأة.

رغم ذلك كانت فعالة في بيتها وكذلك في المجتمع، حيث عملت مع الرجل( زوجا... أباً..أخاً.. إبنا) فعملت في كافة المجالات، حتى في المعارك كانت تشجع وتجهز الرصاص وبعضهن كنَّ ينظفن، السلاح في وقت، كانت وظائف الاسره، محدودة، وعاداتها تقاليدها مرسومة.

ورغم ضغط العادات وتحكم الرجل، استطاعت، ان تنتزع الكثير مما يعزز دورها، حتى اصبحت محل ثقة ،زوجها

والقريبين،منها.

كانت تستقبل الضيوف، رغم غياب زوجها وتقوم بواجبها على اكمل وجه، وبحضور احد الاقارب،، او الجيران، وكان هذا يرضي الكثير من الرجال، لأنها كانت تحترم، سمعة زوجها، وبيتها، وأهلها أما في عادات الزواج، رغم ان الفتاة، والشاب لم يكونا يلتقيان لغرض الزواج، اوجدت

الحياة المشتركه، والاختلاط هامشا مقبولا ان يتعرف كلا

منهما على الآخر واستفادت من ذلك، في المناسبات... الاعياد...الافراح.. والاعمال المشتركه.

لا انكر انه كانت هناك بعض السلبيات الكبيره...اجبار البنت من الزواج من شخص محدد، ..قريبا لها....او غني...

او فقط لانه من بيت، فلان وخواله بيت فلان.

لكن المرأة تمكنت من كسر ذلك الطوق، القاتل نفسيا، واجتماعيا.فبعض الفتيات، لم يتزوجن كردة فعل، ومتن وهن عذارى، لكن حالات اخرى من ردات الافعال..ظهرت

# مقالات



## الأديب: أ. هاشم مراد

2/2

## ..اوراق متناثره.. مكانة المرأة الكوردية.

الخطيفه...و حالات ...انتحار. تلك الحالات كانت محدوده، وكانت ردود الافعال تلك، تمردا على الواقع، وعلى بعض العادات، والعقول المتحجره.
تلك الحالات، مرت بها مجتمعات اخرى في شرقنا
خاصة،لكن بدرجات متفاوته اخف وطأة..الصلح.واشد افظع القتل للتي تخطف.
رغم كل ذلك، ورغم ما عانته
ما تعانيه:
اثبتت الحياة وتجاربها، ان المرأة نصف اي مجتمع فكل، كل مجتمع نصفه مهمش، يبقى متخلفا، عن ركب الحضارة، والتقدم. لكن على الرغم، مما حققته وتوصلت الكثير مما، يليق بها:
= على كافة الجهات،( أنظمة حكم... منظمات... مفكرين..
سياسيين... مدافعين عن حقوق الانسان وغيرهم).
العمل لخلق ظروف افضل، وأفضل، وان تعمل هي جاهدة، من اجل الحصول على كافة حقوقها..على الرغم
مما حققته اليوم حيث اثبتت انها موجودة الى جانب الرجل في اي مهمة..وعمل... وادارة.. وبناء وحرب وسلام، وتعليم.
تحية لها لانها عملت، وتعلمت، وربت الالاف من الكوادر وذوي الاختصاصات لتساهم بذلك مساهمة فعاله
مع المؤسسات التربويه التعليميه، لاعداهم للحياة، والعمل.
بالعلم، والوعي. والتحرر اقتصاديا، ودخول كافة مجالات الحياة. وتوفير الظروف تتمكن المراة من المحافظة على ذاتها وزوجها وبيتها ، ومجتمعها ووطنها.
وهل هناك دور اكبر من هذا الدور في الحياة ؟
اليست هي بالفعل نصف المجتمع؟

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
69
10/6/2025
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەته (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

قصص

الكاتب: أ. أنيس ميرو



# قصة قصيرة البخل

كنا نقيم في محلة (المزار)في( دهوك )القديمة. و التي تسمى الان بسوق جلي؟؟؟
وكان غالبية البيوت شرقية و سكانها
معارف منذ سنين طويلة لفت نضري و سمعي صوت صياح و بكاء شديد
وبعد خروجي من باب الدار لاحظت تجمهراً من نساء. الحي و شبابها وعدد من الاطفال قرب باب( سعيد )وتبين حدث سوء تفاهم بين العمة (منى) و آبن اخيها (سعيد )وتبين انه تسبب بكسر احدى يديها من قبل (سعيد )و كانت (منى )تصيح من الألم ولكن بسبب تواجد الخيرين من ابناء الحي تولوا بإسعافها. و ايصالها لبيت (المجبر )( مصطفى)الذي كان بيته قريباً من دارهم و تولى الرجل. بمعالجة الكسر بالطرق الشعبية و تم تجبيره وكذلك تولى الخيريين لإعادة الصلح فيما بينهم و كانت (منى )قد تزوجت ثلاثة مرات وتوفوا تباعاً ورثت منهم داراً في (الموصل)....
مبالغ لا يعلم بها الا الله. سارت الامور مابين (الموصل و دهوك)؟؟؟
وفوجئنا اصابها بمرض جلدي و لكن بسبب قيام المستشفيات بأخذ رسوم و هو مبلغ (20 فلسً )في وقتها امتنعت (منى )من مراجعة الأطباء بسبب هذا المبلغ و كانت تتردد على دور الأغنياء من أهالي (دهوك في الموصل )وكانوا يعطوها مواد تموينية و ملابس
مستعملة و هي كانت تتولى بيعها في سوق باب (الطوب).
ومرت ايام و سنين و هي على هذا الحال.؟؟
وفي يوم ما جاء تبليغ من شرطة. (الموصل )(لسعيد )ان عمته ( منى)قد توفت و جتتها قد تعفنت في الدار و بعد ان عمت هذه الرائحة الكريهه في الحي بلغوا الشرطة و بعد ان حظرت الشرطة و تم فتح الباب عنوة تبين ان (منى )قد توفت منذ ايام
واستعجل (سعيد )للذهاب (للموصل )مع زوجته (مريم )للتحري عن محتويات بيتها وما خلفته هذه السيدة العجوز و بعد و صولهم للدار تم فحص ما موجود بالدار من أشياء منوعة وتم العثور على مبالغ كبيرة من العملة و كذلكٰ كمية من الصيغة الذهبية و تم بسرعة البرق شراء
صندوق خشبي مع النفتالين السائل و القطن و تم وضع جثتها في هذا الصندوق و تم ا قفاله بأحكام بسبب الريحة المنبعثة من الجثة.؟؟؟
وتم عرض الدار للبيع لكون (سعيد )الوريث الشرعي لها وحده.
وهكذا تم دفن (منى )بعد موتها و تركها لمبلغ كبير مع كمية من الصيغة الذهبية؟!!!
وكانت لا تقدر ان تصرف من مالها على نفسها و كانت تتردد على المعارف للمبيت و الأكل!!!
هكذا البخل يعمي العيون ويقتل المرء جوعاً.!!!!!

69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە

# Gotar

Nivîskar: M. Ferho Ferho



## Xwezaya Qeredaxê û azadî.

Helbet nanê xwezayê، azadî ye, jiyaneke bê tixûb e. Eger xweza hebe û peyda bibe, gerek e mirov tê de serfiraz be, ji ber xwezaya bê azadîbûna mîna çem û deriyayên bê masî ne, lê xwezaya te ey Qeredaxa min a bihêz, Qendîl û zagros û Torosê tîne bîra mirov, tu çiqas ji mirovahiyê re buye hêlîn, tu ciqas ji şaristaniya destpêkê re buye destpêk, bila dilê te di cih di be, va ne neviyên papîr û dapîran careke din xwe berdane li nav dar û guliyên te, mirov li ber bejna te fedî û matmayî dimîne ey şax, dax û çiyayê min ê birêz, ez nizanim çi li ber te deynim û amûrên bedewbûnê ji ku deverê ji te re binim da ku tu bi ser aniya te de berdim, Qerdaxa min a hêja, bi sekna xwe û rawestbûna xwe te xemil û xêl neqişandine, belê mirovê bê henas te bi henas kiriye, û yê bê yar bi dilovan kiriye, û her diçe hezkirin û evîndarî di hembêza te de kate dide, ferhenga peyv û gotinan têra pesindana te nake, ku ez rayên wêje û roman di zeviyên te de berdim xwar, erê çiqas min nerî ji bilî matmaybûnê pê ve min nekişand. ez deyndarê te me hêlîna nirix û rûmetê, kunca berxwedêrên vê xaka pîroz,

Qeredaxa min te cima ji min re nedigot tu ewqas bedew û spehî û xweşik î te cima ji min xeydî buye û qet axaftina min nedikir, ma tu nizanî ez ew tovikê mirovahiyê bûm ku bav û kal û dapîrên min ez ji bejna te re hiland bûm, ma çiqas ken û seyran xwe li bejna te dixwin, tu jî dergûşa min bû yî, dengên van şalûl û bilbilan her tîne bîra mirov dengê lorîna dayikê, di nîvê şevê de û di ber banga sibê de kul û girîn bi lorîna xwe dajot û pê re stranên comerdiyê û xizantiyê tevlî hev dikir lê dilên mirov pê rehet û saxlem dikir. dengê xwe bilind bike Qeredaxa min bila hemû gelê kurd bi te behese ku kunca mirovperweriyê ji vê derê dest pê kiriye.

keziyên te mîna şevên reş û tarî dûr dûr dikişîne û bi ser bejna xwe ya şêrîn de ber dide û kezeba evîndaran dikewîne, min nizanî bû ku dotmama min ewqas bi sosin e, ewqas bi tosin e, ewqas dilşewat û dilnizim, lê di derûniya xwe de ewqas mezin e, li ber coqên te ez rûdinim û çîrokên bêgunih vedibêêjim û tu jî hêdî hêdî destên xwe yên hevrîşimî di nav por û qija min de di be û tîne, xewek li ser çavên min dikeve, lê disa ez dibêjim na na ev roj ne roja raketin û razanê ye, ev roj roja ceng û afirandina çîrokên bedewbûnê ye.

69
10/6/2025
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە

# Gotar

Nivîskar: M. Thomas Edeson



## Bîranînên ji Serdemeke Dilovanî û Sadehiyê

1/2

Pêşgotin:

Di nav qerebalixiya jiyana nûjen de, di nav deng û teknolojiya ku ketiye her quncikê roja me de, bîranîn carinan me dibe rêwîtiyek paşve di demê de, ku dil paqijtir in, rû zelaltir in, û dem hêdîtir û xweşiktir e.

Li wir, ku me zarokatiyek bêhempa di hembêza gund de jiya, sadehiya rastîn tam dikir û kêfxweşiyên piçûk ên ku ji bo me cîhan dihatin wateya parve dikir.

Ne demek dirêj berê, gund bi jiyan û sadehiyê geş bûn, û mirov bi erd û fezayê re di ahengekê de dijiyan.

Di nav bîranînên herî xweşik de ew roj hene ku xwediyê makîneya vermicelli serdana gundê me yê sade dikir.

Ev serdan ne tenê karekî rûtîn bû, lê bûyerek bû ku her kes, ciwan û pîr, her sal di heman demê de li bendê bû.

Mirov li dora wî diciviyan, her malek hevîrê ku ji hêla dayikên xwe ve hatibû amadekirin hildigirt, li benda dora xwe diman, kêfxweşî dilê her kesî tijî dikir. Mezin û xwediyê makîneyê vermîşeliyê bi destan çêdikirin û li hewş an jî erdên bênderan belav dikirin, di heman demê de zarokan dest bi zivirandina fanosa destan a ku ji bo zuwakirina vermîşeliyê dihat bikar anîn dikirin. Ken ode tijî bû, û her kesî xwe wekî beşek ji dîmenek yekane û girêdayî hîs dikir, mîna ku tevahiya jiyana wan li dora vê gavê dizivire. Di dema nîvro de, her kes li bendê bû ku xwediyê makîneyê were mala wan û bi wan re nîvroyê parve

# Gotar

Nivîskar: M. Thomas Edeson



## Bîranînên ji Serdemeke Dilovanî û Sadehiyê

2/2

bike. Êvarê, ew li yek ji malên gund radiza, mîna ku ew endamek malbatê be, di heman odeyê de bêyî ku kes pê bizanibe radiza. Wê demê di nav mirovan de hesta ewlehî û mêvanperweriyê wisa bû. Divê em rojên saliqa (genimê kelandî) ji bîr nekin, dema ku dayik û dapîr di tenûrên mezin de li nîvê kolanê an jî li qiraxên erdên bênderan bulgur dipijandin. Bêhna genimê kelandî ku bi buharê re radibû zarokan ji her malê dikişand, her yek tabaqek xwe ya piçûk hildigirt, di rêzek rêkûpêk de li benda dora xwe bûn, ne bi qaîdeyan lê bi dilên ku mafên hevdu dizanibûn ve girêdayî bûn. Em ê li dora agir rawestin, germahiya wê me hembêz bike. Em ê tabaqên xwe hilgirin û bixwin, bikenin û çîrokên piçûk bibêjin, li benda dora xwe bin ku em bêtir ji şorba xweş bixwin. Ne elektrîk, ne telefon, ne deng...!!!!
Tenê em, sadehî û germî.

Encam:

Dibe ku ew roj biçe, lê bîhn û bîranînên wan hîn jî di nav me de di axaftinên me de û di nihêrînên nostaljîk de dijîn ku me vedigerînin wêneyên ji rabirdûyê ku qet naçin an jî winda nabin.
Ew ne tenê bîranîn in, lê dersên evîn, sadehî, razîbûn, hevkariyê û mirovahiyê ne.
Çiqas dem biçe jî, gund û rojên zarokatiya me dê di dilê me de wekî tiştên herî xweşik ên ku me jiyaye bimînin.
Ew roj di tiştên madî de luks nebûn, lê ew di wate û sadehiyê de dewlemend bûn.
Jiyan hêdîtir bû, lê dil ji bo hezkirinê zûtir bûn.
Xanî piçûk bûn, lê giyan fireh bûn.
Ah, ji bo rojên ku qet venagerin, lê ew ê di dilê me de wekî bîranînên herî xweşik ên ji dema gundê xweşik bimînin.

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

# گوتار



نڤێسکار: م. یعقوب نێروەی

## ئاژانسا جی یا ( یەهودی یا یەهودیها )

## Ajansa cî ya (yehudî ya, yehudîha ) JEW AGENCE

جڤاکا ملەل ئەڤ رێکخراوە یا پێك ئینایی، ئەڤ رێکخراوە پەیوەندیا دەولەتا ئیسرائیل لگەل جیی ێن جیهانێ پێکڤە گرێ دەتن، رستا مەرجێن ب ستایڤەگرتنا سەرپەرستیا فەلەستینێ دا دەستهەلاتدار یا ئنگلستانێ. ل دویف پەیرەو پروگرامێ هەیی د ماددێ ٦شەش دا هاتی وە هەوەسا ئاژانسەکا تایبەت یا یەهودیا بو گۆهرینا هەڤکاری و دیتن لگەل رێڤەبەریا کاروبارێن فەلەستینێ هاتە دامەزراندن. کۆ بکارێن ژلایێ ئابوری و جڤاکی و هەمی رەنگە ئمورێن خۆجهی یێ ڤە بو خەلکێ جی یا کارتێکەر بیتن کۆ هەروەسا ب یاسایی بهێنە نیاسین. ئاژانسا جی یا ڤێگاڤێ رێکخراوەکا جیهانی یە. پەرلەمانێ ئیسرائیلێ لگەل پەسەندکرنا یاسایێ بو ئاژانسا نافبری بمافێ هەندەرانی (برونمەرزی) رازی بو. و ئەو بشکلێ بزاڤا رێکخستنا سەهیونیزمێ دەرئینا. گرنکترین ئەرکێ ڤێ ئاژانسێ بساناهیکرنا کۆچکرنا جی یایە ژدەرڤەی ئیسرائیلێ وە کێشانا وان کۆچکریا بو ناڤ ئیسرائیلێ و هەروەسا پێکئینان و ئاڤاکرنا خانیا و پەرەدان بخزمەتا فەرهەنگی و جڤاکی یا ئیسرائیلی یا. هەروەسا پەیوەندی یا هەیی لگەل رێکخراوێن سەهیونیستێن جیهانێ. ئەگەر وان بڤێت دناڤ دەزگاییێن وەلاتی دا بشکداربن بهەمی شیانێت خۆ ڤە هاریکاریا وان دکەن. ئێکەمین کۆمبونا ئاژانسا یەهۆدی یا یا رێکخراوا جیهانی یا سەهیۆنیزمی ل سالا ١٩١٠ێ هاتە ئەنجام دان ل باژێرێ قۆدسێ.

Ajansa cî ya ( yehudî ya , yehudîha ) JEW AGENCE

**Cvaka mlel ev rêkixrawe ya pêk înayî, ev rêkixrawe peywendya dewleta îsraîl lgel cîy ên cîhanê pêkve grê detin, rista mercên bi stayvegirtna serperistya felestînê da desthellatdar ya niglistanê. Li duyv peyrew prugramê heyî di maddê 6şeş da hatî we hewesa ajanseka taybet ya yehudya bu gohrîna hevkarî û dîtin lgel rêveberya karubarên felestînê hate damezrandin. Ko bkarên jlayê aburî û cvakî û hemî renge murên xochî yê ve bu xelkê cî ya kartêker bîtin ko herwesa bi yasayî bhêne nyasîn. Ajansa cî ya vêgavê rêkixraweka cîhanî ye. Perlemanê îsraîlê lgel pesendkirna yasayê bu ajansa nafbirî bmafê henderanî (brunmerzî) razî bu. Û ew bişklê bzava rêkxistna sehîwnîzmê derîna. Grinkitrîn erkê vê ajansê bsanahî kirna koçkirna cî yaye jdervey îsraîlê we kêşana wan koçkirya bu nav îsraîlê û herwesa pêk înan û avakirna xanya û peredan bxizmeta ferhengî û cvakî ya îsraîlî ya. Herwesa peywendî ya heyî lgel rêkixrawên sehîwnîstên cîhanê. Eger wan bvêt dnav dezgayên wellatî da bişkdarbin bhemî şyanêt xo ve harîkarya wan dken. Êkemîn kombuna ajansa yehodî ya ya rêkixrawa cîhanî ya sehyonîzmî li salla 1910ê hate encam dan li bajêrê qodsê.**

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



گوتار

نڤیسکار: م. خورشید توفیق باکوزی

# چەمکێ پێکڤەژیان و لێکبورینێ یان لوژیکا تۆلڤەکرنێ

دەمارگیری ب هەموو ئاوایەکی دبیتە رێگر و بەربەستەکا ئەبستۆملۆژی و جڤاکی، د هەمان دەمدا کارتێکرنەکا نەرێنی ل سەر پێکڤە ژیانێ و هەڤبەندیێن جڤاکی و پێشکەفتن و وەرارا جڤاکی دکەتن. پێکنەکرن و لێکنە چوونێن فرە هزری و پولێتیکی و ئیدولوژیێن ژ هەڤ جودا و نەبوونا دیالوك و ئالوگورکرنا تێروانین و بیرورایێن تەندروست و ساخلەم، دناڤ پارت و کومەلە و تەخە و توێژێن جڤاکێدا و نژیارێ باوەریا دورست و راستەقینە دروخینیتن و دهەلوەشینیت.

دەمارگیری د کاکلك و ناڤەروکا خودا، رەتکرن و زالکرنا راو بوچونانە ل سەریێ دی. گەلێ کورد ئەڤرو ژ هەر دەمەکی پتر پێویستیا ب بهاو باوەریێن لێکبورینێ هەی، وەك دیدەکا کوردایەتی و مرۆڤایەتی و ئاکار و بەرژەوەندیێت گشتگیرێن نیشتیمانی و نەتەوی. ژبەرکو پرۆسا لێکبورینێ، پێویستیەکا جڤاکی و دیروکی یە. پاراستنا هەڤگونجاندنا دوستایەتی و هاریکاری و پێکڤە ژیانێ یە، پاراستنا رەوش و بارێ جڤاکی و هەڤسەنگیا ئیرادە و هێزێن جڤاکیە. ژبوو بەرز راگرتنا دەسکەفتێن نیشتیمانی یێن چارەنوساز. ژبوو روخاندن و نەهێلانا گرژی و ئالوزیان و دەربازکرنا ئاستەنگان.

لێکبورین لجەم مەکوردان، هەردەم چەمکەکێ خرت و هشکبوویە. هندی بێژی ل جەم کەسێ کورد، چەمکەکێ گران و قورس بوویە. هەردەم لێکبورین وەك کێماسی و ژبەر داگێران دایە زانین. ئەڤە ژی ڤەدگەریێتەڤە ژبو نەبوونا هوشیاریا جڤاکی و نزمیا ئاستێ روشنبیری لجەم تاکێ کورد .(جان جاك رۆسۆ) دبێژیت " چو کەسەك مفای ژ هندێ نابینت، کو بەرامبەرێ خۆ بێخیتە دژێر رکێفا خۆدا". لەورا دڤێت مرۆڤ ل سەر چەمکێ لێکبورینێ بژیت. داکو ڤیانێ و خوشەویستیێ بەلاڤ بکەتن و باوەریبوونێ و پێکڤە ژیانێ ل سەر شەنگستێ وێ ئاڤاکەتن، نەکو هەردەم هزر دتۆلڤەکرنێدا بکەتن.

69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمیة و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



# بوچوون

نڤیسکار: م. هەرمان باوەرکی

## بو چ  بریارا درست بو هەلبژارتنەکێ ناهێتە دیارکرن!!!!
## بەلێ یان نەخێر

دێ چاوان شێن بریارێ سەر ئێک هەلبژارتن دەتن کو دەمێ هەلبژاتنا درست یا بەرچاڤا ویا رون و ئاشکرابیت !!

....ئەڤ ئالوزیا ئەڤ مللەتە کەفتیە تێدا ژبەر ڤێ گرێکا مێشکی ل دەڤخو پەیداکری وەک راستاندنەکێ لێ کری کو خودان نەشێت بریارێ بدەتن ژبو هەر تشتەکێ کو مفا وزیان یان باشی و خرابیێ ژێک جودا بکەتن ئەڤەیە!!!

دەمێ فەیلەسوفێ فرەنسی (جان بوریدان) یان ئەڤ سەرهاتی یە ب کەرێ بوریدانی هاتیە ناڤکرن دەمێ دبێت خودانێ ڤی کەری رادبیت ڤی کەری برسی وتێهنی دکەتن هەتا بگەهتە وی رادەی برس و تێهنی وی ژهێزێ خلاس دکەتن، پاش خودانێ  وی رادبیت ((دەولەکا خارنێ و ئێکا ئاڤێ ))هەر ئێکێ دانتە رەخەکێ وی کو هەردو دەولە هندی ئێک پیڤان ژ کەری دیرن...

...ل ڤێرە دێ پسیار پەیدا بیت کا دێ کەر چ کەتن!!!

بەلێ وەک دیار ڤی کەری هند بریار و پشت راستی بخو نەبو کا دەست پێکێ ئاڤێ ڤەخوت یان خارنێ، ڤێجا ما د وی حالی دا کا دێ چ هەلبژێریت ،بەلێ دوماهی یێ ژیانا خو ژدەست دا ....

ئانکو دەمێ مروڤ گەهشتە وی رادەی کو هند پسیارو بەرسڤ هزرکرن ژ مێشکی راستاندن وێ گاڤێ دێ ژیان لێ بەروڤاژی بیت هەمی بیتە ئاستەنگ و نەخوشی و ب زەحمەت قورتالبون هەبیت ب ڤێ بێ هشیا مروڤ دکەتن..

چارە دڤێت خودان بریاربیت دەما ئەو گرێکێن مێشکی دڤەکەتن ئەو ب رێکا هزرکرنێ دێ بیتە خودان بریار و باوەری بخو هەبیتن کا هەر پرسگرێکەکا بکەڤیتە درێکا وی دا چارەکەتن...

69
Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
kovar Fermî û destûr da ye (المجلة رسمية و مرخصة) گۆڤار فەرمی یە وخودان مولەتە



## گۆتار

نڤێسکار: م. جەلال سیتکانی

# خەیاڵی من..

لە خەیاڵی مندا، داهاتوو دەریایەکە لە ڕووناکی؛ ئەستێرەکان گەشترن و ئاسمان شینتر.
مرۆڤەکان وەکو ڕیزی پەپوولە، دەست لەناو دەست بەرەو ئاسۆیەکی بێسنوور هەنگاو دەنێن.
منداڵەکان بە شادییەوە فێردەبن، پیرەکان بە ئارامییەوە پشوو دەدەن، گەنجەکان بە ئومێدەوە داهێنان دەکەن. لەویادا، تەکنەلۆژیا ڕۆحی بە بەر کەوتووە - نەک ئێمە بکاتە کۆیلە، بەڵکو زنجیرەکانمان بپچڕێنێت.
زەوی، ئەم گەوهەرە شینە، سەوزتر و جوانتر دەردەکەوێت. مرۆڤ و سروشت پەیمانێکی نوێیان بەستووە؛ هەناسەیەکی پاک و ژینگەیەکی پاراو، میراتی منداڵەکانمانە.
ئیتر زانست و هونەر دوو ڕووی یەک دراون. دڵ و مێشک، هەست و بیر، وەکو دوو باڵی باڵندەیەک پێکەوە دەفڕن بەسەر چیاکانی ناکامیدا.
نەخۆشی، برسێتی، جەنگ - لە مۆزەخانەی مێژوودا وێنەیان هەڵواسراوە. یەکگرتن بووەتە هەناسەی کۆمەڵگا، هاوکاری جێگای کێبڕکێی نەگرتووەتەوە، بەڵکو یاریدەری داوە.
هەر منداڵێک دەتوانێت لە ئەستێرەی خۆی بڕوانێت و بڵێت: "دەتوانم پێت بگەم". چونکە دەرفەت بۆ هەمووانە، نەک میراتی کەمینەیەک.
پەیوەندییەکان ڕەسەن و ڕاستگۆن، نەک تەنها وێنەیەکی جوان لەسەر شاشەیەکی سارد.
چاوەکان ڕاستەوخۆ لە چاو دەڕوانن، دڵەکان زمانی یەکتری تێدەگەن.
لە یادەوەری مێژوو فێردەبین، بەڵام بە کۆتی ڕابردووەوە ناخنکێین. لە ڕەگەکانەوە فێر دەبین، بەڵام بۆ ئاسمان سەر هەڵدەبڕین.
سنوورەکان وەکو هێڵی شیعر، جوانی بەخشن نەک جیاکەرەوە. جیاوازییەکانمان وەکو ڕەنگەکانی کەوان جوانن، یەکسانیمان وەکو تیشکی خۆر هێزبەخشە.
ئەمە خەیاڵی منە، جیهانێک کە دەکرێت بێتە دی. وەکو گوڵێک کە لەناو دڵدا دەڕوێت، دەتوانێت بەری خۆشەویستی و ئاشتی بگرێت.
با دەست بەکار بین، کاتێک کە خەیاڵێک هاوبەش بێت، دەبێتە هێزێکی بێسنوور.
داهاتوو چاوەڕێمانە، بە گوڵە خونچەیەکی گەشەوە پێشوازیمان لێدەکات.

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمیة و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



# گوتار

نڤێسکار: م. ناجح بێجانی

## ئاخفتن وکریارییێن مە بلا ئێک بن

گەر پێداچۆنەک سەرپێ ل هەمبەر ئاخفتن وکریارپیێن خۆ یێن ڕۆژانە بکن بۆمە خۆیا دبیت کو ئاخفتنێن مە دبن جهێ باوەریبوونێ دناڤ جڤاکیدا، ئەرێ مە شیایە هەر ئاخفتنەکا هات سەر ئەزمانی مە یان گۆ هـ لێ بووی، مە باش هزرا خۆ تێدا کریە بەری ژ دەڤی دەرکەڤت دێ بتە جهێ ڕازیبوونا یێ بەرانبەر، ئەرێ کریارییێن مە ل دووڤ ئاخفتنا مەنە یان بەرەڤاژی ئەزمان و دل وکریارییێن مە ژی هەڤدژن، ئەرێ مانە گۆتن و پەیڤێن جوان و نەرم رفتارو کەسایەتیا مرۆڤی نیشان ددەت کا مرۆڤ چەند یێ ڕاستگۆیە دگەل خوە بخوە، چونکو کوردا ژمێژە یا گۆتی ( ب ئاخفتنا خۆش وپەیڤێن جوان مرۆڤ دشێتن ماری ژ کۆنێ بینتە دەرێ، ئاخفتنا خۆش و نەخۆش ژدەڤەکی دەردکەڤن ) ما چێدبت هەما چ هات سەر ئەزمانێ مە وەکو کوردا گۆتی: بکن سەر بەڕکێ، بێکو بزانن ڤەڕێژا وێ ژی باشی و خرابیێن خوە هەنە و ئەنجام دێ چ بن، زانستیێ سەلماندیە ئاخفتنا ئەرینێ و دلڤەکەر پەیوەندیەکا بهێز و چالاک دورست دکت دناڤبەرا دل ومێشکیدا و لەش ئارام دبت، نابت هەر ئاخفتنەکا تە بهیست ئێکسەر ڤەگۆهێزی ل سەر زێدەکەی، ئاخفتنێن باش دبن خێرو سەدەقە وچاکی کو ئەوژی سەربلندی یە بۆ مرۆڤی، جارەکێ تە پسیار ژ خوە کرییە بۆچی تو هندە یێ بلەزی بۆ ئاخفتنێ؟ باشترە پەیڤێن جوان و نەرم هەلبژێری دا یێ بەرامبەری تە دلگران نەبت، هەول بدە دگەل کەسایەتییا تەبگونجیت ول سەرخوەبە د دانووستاندا، گۆهداریا یێ بەرامبەر خوە بکە، ل دووڤ پیزانینێن خۆ بەرسڤێ بدە، دڤێتن ئەو بەرسڤ ب بت جهێ باوەریا کەسێن گۆهدارییا تە دکن، هینگێ کەسایەتیا تە دهێتە نیشاندان وبەرچاڤ دبت، چونکو یێ بەرانبەر رەفتارو کریارییێن مرۆڤی هەلسەنگینیت دێ هێزو سەنگا تە خۆیا بت و بێهنفرەهـ باشترین چارەیەو ژ گۆهدارا بە، ئانکو ب ڕۆهنتر بێژم بابەتێن نە ب ژیانا تەڤە گرێدای خۆ ژێ دووربگرە و مایتکرنێ تێدا نەکە دا بمینی خوەشتڤی دناڤ جڤاکیدا، لەومانێ باشترە خۆ ژ ئاخفتنێن بێ سەروبەر دووربگری، هەردەم بزاڤێ بکە ژوان کەسا بن یێن ئارام و سەربلندو بەختەوەر بژین.



## بوچوون

نڤیسکار: م. محمد مراد فتاح

# ئازادییا خو مە ژبیرکر

لسەر دەمێ رژێمێ دناڤبەرا سالێن( 80 بو 91) کو مللەت هەمی بن دەست بوو، دبن زولم زورداریەکا بێ وێنە دا بو، چو زەلامێن وی سەردەمی هەست ب زەلامێنیا خو نە دکر، ژ ترس و گەڤێن رژێما بەعس دا، ب هەمی رەنگەکێ گەنج زاروك و زەلام ،پیر و ژن دهاتن رەزیلکرن، سەخمەراتی وێ زولما لسەر مللەتی هەی، د گەلەك پرسێن نەتەوی دا ل وی سەردەمی ،سەردەمێ بن دەستیێ، حەز و ڤیانا خاك و نیشتمانی و هزرا نەتەوی زور بهێز بوو، هەتا لبەرکرنا جلێن کوردی........
زوربەی خەلکێ جلێن کوردی روژانە لبەر دکرن، سەخمەراتی گەڤێن لسەر، بەلێ گەنج و زەلام و پیرا بێ هیچ هەلکەفت جلێن کوردی لبەدکرن، و قەد ژ دوژمنی نەدترسیان، هەتا جلێن کوردی و قماش ژی زور دکێم بون و بترسی ل دورینگەها دهاتن دورین و پەیداکرن، هەتا ل زالگەهێن رژێمێ دا، دەمێ گەنجەك ب جلێن کوردی ل زالگەهێن رژێمێ دا، گەنج رادگرتن و گوملەکێن کوردی ژبەر دکرن و زور جارا سەرملکێن گوملەکا دراندن و ژێ قەدکرن، رەزیل دکرن، و دگوتن جلێن وە
یێت پێشمەرگانن ونابت هون سەرملکا ب جلێن خو ڤە چێ کەن،سەر ڤێ زولمێ را، مللەتی جلێن کوردی لبەر دکرن...
ئەڤرو دڤێ ئازادی و دیموکراتیێ دا، و هەبونا سەدان رێکخراوێن مەدەنی و هەبونا دە یان حزبێن سیاسی لێ هەستا نەتەوی لاوازە، کو بیرەوەریێن نیشتمانی بوینە روژەك دا بهێنە بیرئینان،،؟
1..ئێك روژ بو جلێن نەتەویی نە، ئەڤە سەد سالە باب و باپیر و دەیکێن مە یێ لبەر دکەن، نەك فلکلور و پاشماوەکێ کەڤنە و ناهێتە بکارئینان هەتا ببیت فلکلور و بهێنە نمایش کرن، جلێن مە زیندی نە،،
2..راستە جلێن کوردی دام دەزگەهێن میری دا، نە د فەرمی نە، بەلێ نابت کێشە ،کو ئەگەر مروڤ حەز ژ جلێن نەتەوی بکەت و شانازی پێ پێ بیەت دێ ل پشتی کارێن فەرمی لبەر خوکەی....
3..هەمی مللەتێن جیهانێ ب جلێن نەتەوی دهێنە ناسکرن، ئەگەر گرنگی ب جلێن نەتەوی نە هێتەدان، تنێ روژەکێ لبەر بکەین، رەنگە کورد دناڤ جیهانێ دا بەرزەبین..
4..چو نەتەوێن وەك عەرەب و هندی و ئەفغانییا روژا جلێن نەتەوەی نینن، و ژمە پتر جلێن خو یێن نیشتمانی لبەر دکەن، مە گولێ نەبویە کو بیست و دوو دەولەتێن عەرەبا هەنە روژەکێ بو (کەفی و عەگال ودشداشا )دانن..

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



## بوچوون

نڤێسکار: م. شڤان دێمکی

# پەسن و سالیسی ژ هەڤ جودانە

هەبوون و نەمرینا گەلان و ئاڤابوونا وەڵات و دەولەتێن نها هژمارا وان نێزیکی ٢٠٠ دەولەتێن باوەرپێکری ژ ڤالاهیێ نەهاتینە، بەلکو ب هزاران سەرکردە و خەباتکار و زانا و مرۆڤێن بلیمەت ژێ پەیدابووینە و بووینە پێشەوا و سیمبۆل و ناسنامە یێن وان و خەلک و خامەدار و بەرەباب و نەڤیێن پشتی وان ب چاڤەکی پری رێز لێ د نێرن و راپۆرت و نامیلکە و پەرتووک و نامەیێن ماستەر و دکتورایێ ل سەر دروستکرنە.

مللەتێ کورد یێ بێ وەڵات یێ کو خودان دیرۆکەک دوور و درێژ ژی ژ ڤێ چەندێ بێ بەهر نینە و هژمارەکا زاڤ یا سەرکردە، جانگۆری، وەڵاتپارێز و کەسێن زانا و بلیمەت ژێ پەیدابووینە، لێ یا کو جهێ حێبەتیێ و بەرگۆمانێ ئەوە هێشتا گەلەک ژ مە ژ سەدەمێ هەبوونا دەمارگیریەکا پری نەڤیان، دل ڕەقی و چاڤ پێ نەڕابوون گرنگی و بها یێ ڤان کەسان نەزانی یە و ئەوێن دزانن ژی ب گرۆڤەیا سالیسیێ رێگری لێ دئێتەکرن و ب نەچاری ژ پەسن و ستایشا وان دووردکەڤن، د دەمەکی دا کو پەسن جورەک و چەڤەک ڤەنەڤەتیاییە ژ ئەدەبی، چونکی پەسن یا پڕە ژ پەیڤ و گوتنێن جوان و بهاگران کو ئاراستەی وان کەسان دئێتەکرن یێن کو ژ هەژی وێ پەسنێ بن و ژ هندێ مەزنتربن کو تنێ ب سوپاسیەک سادە دەربڕینێ ژ شیان و ماندیبوون و خەمخۆرییا وان د وی بوارێ تێدا سەرکەفتن ئینای وەک ( نیشتیمان پەروەری، زانستی، کەلتووری، جڤاکی، ئەدەبی و هتد ) دا بکت.

جڤاکناس و زانایێن دەرۆنی د وێ باوەرێدانە کو پەسن جورەکە ژ هاندانێ و پەسن و هاندان ب هەڤڕا د بنە پشت و پەنا و وڕەیەکا زێدەتر ددن مرۆڤی کو ب بەردەوامی و بێ ڤەقەتیان درێژییێ بدت وی کارێ پەژراندی و ب دل، یێ کو جڤاک و دەورۆبەر پێدڤی، چونکی مرۆڤ یێ تژییە ژ کۆمەکا هەستان و ل دەما وەرگرتن و گولێبوونا ئاخفتنێن جوان، شرین و پڕی سۆزداری هەست ب ئارامییەک زێدەتر دکت و د بتە ئەگەرەک ب هێز و کاریگەر لسەر ڤیان و شیانێن تاکەکەسی و دیسان هاندانەکە ژ بۆ بەرەباب و کەسێن دووڤڕا کو بەردەوامییێ بدن وێ ڕێک و ڕێبازێ، لەوڕا زانایێ جیهانی ( مارک توین ) دبێژت: " ب ئاخفتنەکا خوەش ئەز دشێم سێ مەهان بژیم "

ئەڤجا گرنگ و پێدڤییە جوداهییێ بێخینە د ناڤبەرا پەسنێ و سالیسییێ دا، کو هندیکە پەسنە کەسێن شەهرەزا و خودان خامە یێن زێڕین ب وژدانی و دل و دەروونەک پاڨژ و بێ بەرژەوەندی بۆ کەسێن ژ هەژی دکن، لێ بەرۆڤاژیا وێ کو سالیسی یە کەسێن بێ قیمەت بۆ کەسێن نە ژ هەژی دکن ب مەرەما ب دەستڤەئینا هندەک پلە و پوست و تشتێن بێ بها، لەوڕا فەرە خوە ژ سالیسی یا بەرهەمێ وێ تنێ هەتکبەری دوور بێخین و خوە ل پەسنێ بکین خوەدان.

Kovara Nivîser ya Ruşenbiri
69
10/6/2025
مجلة الكاتب الثقافية
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمية و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye



# پەند و سەڕبوڕ

نڤێسکار
م. دلێر نەزیر

شیرەتێن بابەکێ ناڤ ساڵ ڤەچووی
بۆ کوڕێ خوە:
کوڕێ من هەمی کەسا ناسبکە،
هەڤالینیا هەمی کەسا نەکە،
ل هەمی جهان شارەزا ببە،
بۆ هەمی جهان نەچە، هەمی تشتان ببینە،
باوەر ژ هەمی تشتا نەکە، گوهێ خوە بدە هەمی ئاخفتنا،
بەلێ هەمی ئاخفتنا نەبێژە،
ئەگەر دنیا هەمی ستری بیت، توو هەر وەکی گولان بە،
ئەگەر ژ سەرمادا رەق ببی، کراسێ خرابیێ ل بەر خوە نەکە،
ئەگەر ژ تێهنادا بخەندقی وێ ئاڤێ نە ڤەخوە یا ئاقلێ تە بیت،
ئەگەر کەسەکی دلێ تە شکاند،
تو دلێ کەسێ نەشکێ نە چونکی پرکرنا نهالەکا ئاڤێ ب ساناهیترە ژ ساخکرنا دلەکی،
ب گریا کەسەکی نەکە کەنی،
نەهێلە کەس ب گریا تە بکەنیت،
مافێ کەسێ نە خوە، بۆ مافێ خوە گوریکەربە،
نهێنییێت خوە بۆ هەمی کەسا نەبێژە،
نهێنییێت خەلکێ بپارێزە،
ل هیڤیا هندێ نە بە روویدان تە بگوهوڕن توو بخوە رووی دانا بگوهورە،
بلا پەیڤێن تە ژ ناخێ دلێ تە بن،
چ پەیڤا بێ هزرکرن نەبێژە.

69
Kovara Nivîser ya Ruşenbirî
مجلة الكاتب الثقافية
10/6/2025
گوڤار فەرمی یە وخودان مولەتە (المجلة رسمیة و مرخصة) kovar Fermî û destûr da ye

# شیرەت د هەلبەستا من دا

کوپیتکا چیا زەحمەتە کانی هەبن
زڤستان د سارن گەرم ژێ درەڤن
بێ دەنگ نزانن باخڤن دانە کەڤن
سە لدورا پاکا ئەو دێ هەر رەون

.......

کا چەوا پیڤاز دێ هەر پیڤاز بت
بن د ئاخێ رابت هەتا سەر رابت
ئەوێ دلسوز دێ هەر دلسوز بت
ل تەنگاڤیان دێ ل سەر دوز بت

.....

نا رابن مری؟ چەند بو بکی گری
ئەو نەهەڤالن سەرنخیم و شڕی
حیزێ چاڤبرسی وەکا سیخوری
ژێ دویر کەڤە؟ بڤەترە ژ ئاگری

......

بێ نژادان چ جارا لوما ژێ نەکن
رەوشت بەرزەنە؟ مەژی تەنەکن
د بێ شەرمن! ئەزمان خوەشکن
راستی و درەو لدەف وان یەکن

.......

دزێن ئەمانەتی دەم دەمێ وانە
خو سوجدا ئەوان بو فێلبازیانە
مزگەفت بو وان هەچکو کولانە
بهەمی کارێن وان خودێ دزانە

یێ تو هێلایی ل دەمێ کەفتی
شاد نابت بتە و تو سەرکەفتی
نەبێژە هەڤالە ژەهری ددەستی
ئەو دل رەشە تەژی بێ بەختی

.........

دارا چ بەرهەم؟ چ ژێ نە ئێت
کانیا هشک و ئاڤ ژێ نە زێت
دیوانا؟ چ بهایێ تە لێ نەبیت
لێ نەروینە ژ خوە بکە فهێت

............

یێن لەگلەگە بو بەرپرس و ئاغا
مروڤ پەرێسن! بدن وان شاخا
ئەو ئامادەنە ب فروشن کەماخا
نەزانێن ڤالەنە ژ خیرەت و زاخا

...............

ژ قەلسا دویر کەڤە دا نەهتکی
ئبلیس ژێ درەڤە، تو دێ چکی
قەلەرەشک نابن باز خو چ بکی
زانین باشترە ژشال و شەپکی

---------

نەزیر چەمباهیڤی/ زاخو ٢٠٢٠

